



Araştırma Makalesi • Research Article

Nû-varyanteke Mem û Zînê ya Dengbêjê Elaşgirî Kazoyê Garisya: Nirxandineke

Pêwendî û Bernivîsandin

Eleşkirtli Dengbêj Kazoyê Garisya'nın İcra Ettiği Mem û Zîn Varyantı: Bağlamsal Bir Değerlendirme ve Metinleştirme

A New Mem û Zîn Variant by Dengbêj Kazoyê Garisya from Eleşkirt: Contextual Analysis and Textualization

Ömer Delikaya*

Kurte: Di vê xebatê de nû-varyanteke destana Mem û Zînê ya Dengbêjê Elaşgirî Kazoyê Garisya û hevalê wî Dengbêj Dursin tê vekolîn ku di şeveke dawetê de ji bo cimaeteke mêvan û dengbêjan hatiye îcrakirin. Ev xebat, danûstandin, tevkariya cimaeta hazir û guhdar û reaksiyonên wan ên li ser qeyda deng a destanê paşguh nake û pêwenda çandî û rewşî ya performansa dengbêj(an) dinirxîne. Bi vî karî, ev xebat ji bernivîsandê wêdetir, lê dixebite bizane bê ka xwezaya dînamîk û paşxaneyî çandî û civakî ya performansa dengbêj çawa tesîrê li vegêrana wî/wan dike. Di vê xebatê de bernivîsandina metna destanê jî cih digire ku heta îro di arşivan de mabû. Xwe bi spartina modela Lauri Honko ya “tekstûalizasyon”ê re, ev xebat pêvajoya dînamîk a performansê û rehendên çandî û civakî yê pêwendê jî digire ber çavan û armanç û niyetên ku di pêvajoya bernivîsandina ji materyala devkî ber bi forma nivîskî jî vedikole. Di heman demê de, di pêvajoya bernivîsandinê de, bala xwe dide li ser destwerdan û pratîkên (rê)zimanî yê ku ji bo afirandina “metneke kamil” (*master text*) derdikevin pêş bi taybetî di berhevkirin û bernivîsandina destanên kurdî de. Bi vê mebestê, balê dikişîne ser rê û rêkareke bi baldartir ji bo çareserkirina meseleyên tevlihev ên bernivîsandina performansên kurdî ku wekî kaset berî wextan hatine tomarkirin.

Peyvên Sereke: Mem û Zîn, Kazoyê Garisya, Elaşgir, Bernivîsandin, Destan, Dengbêj.

Öz: Bu araştırma, ünlü Kürt destanı Mem û Zîn'in, Eleşkirtli Dengbêj Kazoyê Garisya ve arkadaşı Dengbêj Dursun tarafından, aralarında diğer dengbêjlerin de bulunduğu geniş bir izleyici kitlesine bir düğün gecesi icra edilen sözlü bir varyantını ele almaktadır. Çalışma, dengbêjlerin söylemleri, izleyicilerin anlatıya katkılarını ve Mem û Zîn'in kaydına verdikleri tepkileri de içeren performansın kültürel ve bağlamsal çerçevesini analiz etmektedir. Bu çalışma, basit bir transkripsiyonun ötesine geçerek, performansın dinamik yapısının ve sosyo-kültürel bağlamının anlatıyı nasıl şekillendirdiğini inceler. Kaset formatında günümüze ulaşan destan metninin bağlam odaklı bir analizi ve metinleştirilmesini sunan çalışma, Lauri Honko'nun “metinleştirme” kavramından hareketle sözlü edebi malzemenin yazılı hale dönüştürülmesindeki bilinçli niyet ve amaçları incelerken, performansın dinamik sürecini

* Dr. Öğr. Üyesi, Bingöl Üniversitesi, Fen Edebiyat Fakültesi, Doğu Dilleri ve Edebiyatları Bölümü, ORCID: 0000-0001-6505-5107, odelikaya@bingol.edu.tr

Cite as/ Atıf: Delikaya, Ö. (2024) Nû-varyanteke mem û zînê ya dengbêjê elaşgirî kazoyê garisya: Nirxandineke pêwendî û bernivîsandin. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 12(3), 1217–1246.

<https://doi.org/10.18506/anemon.1543219>

Received/Geliş: 3 Sep/Eylül 2024

Accepted/Kabul: 12 Nov/Kasım 2024

Published/Yayın: 30 Dec/Aralık 2024

ve bağlamın kültürel ve sosyal boyutlarını da dikkate almaktadır. Metinselleştirme sürecini göz önünde bulunduran bu çalışma aynı zamanda Kürtçe destanların derlenmesi ve metinselleştirilmesinde görülen dilsel müdahaleleri ve uygulamaları da incelemektedir. Bu bağlamda araştırma, Kürt sözlü anlatılarının metinleştirilmesinde daha titiz bir yaklaşımın gerekliliğini vurgulamaktadır.

Anahtar Kelimeler: Mem û Zîn, Kazoyê Garisya, Eleşkirt, Metinleştirme, Destan, Dengbêj

Abstract: This research examines a newly documented oral variant of the renowned Kurdish *destan* Mem û Zîn, performed by Dengbêj Kazoyê Garisya from Eleşkirt and his friend Dengbêj Dursin at a wedding ceremony for a large audience, including other dengbêjs. The study analyzes the socio-cultural and situational context of the performance, including the dengbêj's spontaneous commentary, the audience's contributions to and shaping of the narrative, and their responses to the performance. It moves beyond simple transcription, analyzing how the dynamic nature of the *destan* performance and its socio-cultural context shape the narrative, generating a collective interpretation. The study offers a context-centered analysis and textualization of the epic text, which has survived in cassette form. Employing Lauri Honko's concept of "textualization," the research explores the conscious intentions and purposes involved in transforming this oral literary material into written form, while acknowledging the dynamic process of performance and the cultural and social dimensions of the context. By understanding the process of textualization, this study investigates the editorial interventions and practices used to create a "master text" in the compilation and textualization of Kurdish epic material; this includes examining how editorial intervention led to the removal of dialect features in various editions, while even more extensive cuts and changes were made concerning the representation of women and religious allusions. The research contributes to a deeper understanding of the cultural significance of the Mem û Zîn narrative within Kurdish society and the complex and often problematic process of textualizing Kurdish oral performances.

Keywords: Mem û Zîn, Kazoyê Garisya, Eleşkirt, Textualization, Epic, Dengbêj

Destpêk

Li gorî gelek vekolîneran, Mem û Zîn a ku piştî xwe dide nerîta devkî û bi sedan sal e sing bi sing li ser zar û zimanan hatiye vegêran û di nav piraniya şêwezarên kurdî de belav bûye, yek ji wan navdartinên vegêrana çanda devkî ya kurdî ye. Bêguman, di navdarbûna wê ya di nav sedan vegêranên devkî û hetta cureyên vegêranî yê folklorîk de, rola Mem û Zînê ya Ehmedê Xanî jî ne kême. Nivîskarê navdar ê kurd Hêmin Mukrîyanî li ser navdarbûna Mem û Zînê dibêje "be naw û bangtirîn çîrokî Kurdî" (vgz. Jahany & Çiftçi, 2020: 19). Çawa ku Mem û Zîna devkî jî aliyê binyada vegêranî û qalibên zimanî ve tesîreke berçav li vegêranên devkî ên din kiriye, herwisa jî Mem û Zîn a nivîskî ku Ehmedê Xanî wekî mesnewî jî edebiyata klasîk a kurdî re hêlaye, tesîreke eşkere li ser berhemên edebî yê li dû xwe kiriye. Bi vî rengî, Mem û Zîn¹ hem bi awayekî nivîskî hem jî bi awayekî devkî wekî du çandên jî dinyayên cuda (nivîskî û devkî) û berhemine kanonîk derketiye pêş çavan. Destanên wekî Dimdim, Leyla û Mecnûn (Mihemed Emîn), Zembilfiroş an jî Mem û Zîn bi sedan sal in hem bi devkî û hem jî bi nivîskî di nav tedawileke dewamdar de hem jî aliyê dengbêj û çîrokbêjan ve hem jî jî aliyê şairên edebiyata klasîk ve gihîştine roja me. Eger meriv jî bo Mem û Zînê bibêje, gelek hêlên wê yê xurt kiriye ku her du vegêran jî (ya devkî û ya nivîskî) hem di nav vekolînên edebiyata klasîk de hem jî di nav ên edebiyata kurdî ya gelêrî de bibin babetên bi dehan xebatên berhevkarîyê, danberhevîyê û nixandinê. Divê bê zanîn ku Mem û Zîn wekî Leyla û Mecnûn, Sîyabend û Xecê, Dimdim, Zembilfiroş, Şîrîn û Ferhad û gelekên din hem bi kurmancî hem jî bi soranî (bnr. Kurdo, 1996; Folklore Kurdî, 2019) tê îcrakirin. Ev vegêrana navdar di berbelaviya xwe ya li erdnigariyeke berfireh de bi zazakî (Volkan, 2019:53, 54; Gökalp, 2021) û bi hewramî (bnr. Ölmez, & Vali, 2020; Cîhanî, 2022) jî peyda dibe. Bi vî taybetmendiya xwe ya peydabûna di piraniya şêwezarên kurdî de, ev vegêran wekî vegêraneke neteweyî û pir-şêwezarî derdikeve pêşberî me.

Mem û Zîn, jî pir hêlan ve jî wan gelek vegêranên kurmancî cuda dibe jî ber ku cihekî wê yê xas di nav edebiyata kurdî ya devkî de çêbûye. Ew hem jî aliyê rûxsarê ve hem jî jî aliyê binyada xwe

¹ Li devera Berfiratê, bi taybetî li Efrînê Mem û Zîn zêdetir wekî Memê Alan tê nasîn û vegêran. Lê meriv dikare bibêje ku navê eslî û esasî û belkî navê herî berbelav li erdnigariya kurdî de Mem û Zîn e, ne ku Memê Alan.

ve bûye yek ji mînakên xurt ku ji skelet û awayê vegêrana wê tesîr li vegêranên epîk û evîniyê kiriye (ji bo tesîra Mem û Zînê li ser rêzerûdan û motîfên Xelîl Beg û Gewrê, bnr. Subaşî, 2023: 156). Wekî vegêraneke navdar û giring a çanda kurdî ya devkî; Mem û Zîn, ji ber hindê ji hemû aliyên xwe ve hêjayî vekolînan e û hemû varyantên nû yên ku li vê qada vekolînê zêde dibin, xwedî giringiyeke eşkere ne, ji ber ku derî li nîrxandinên nû yên li ser rehendê vegêran û binyada wê vedikin. Di nav hemû destanên kurdî de, diqewime ku di nav şewezarên kurdî de destana herî zêde şax û varyant jê peyda bûne Mem û Zîn be. Tenê performansên devkî yên berdest xwe digihînin dereceyeke bilind a hejmarî, lewma ihtimal e ku bi ser hevdu hem bi devkî (tomarên devkî yên kasêtan) hem jî bi nivîskî (dengên ku hatine bernivîsandin û varyantên kevn ên nivîskî) bi ser sedî re bin.² Ev vekolîna berdest, performanseke devkî ya bi navê “Memo û Zînê” dide ber xwe ku tam sala wê ne diyar e (teqriben derdora salên 1980/90î), wê ji ber dengê Dengbêj Kazoyê Garisya (1925-2005) û hevrêyê wî Dengbêj Dursin berdînivîse û li ser hin xalên wê yên têkildarî pêwend û performansan wan a adetî û taybetmendiyên naverokî û tevkarî û xebirdanên di navberan de dinirxîne. Hêjayî bibîrxistinê ye ku Dengbêj Kazoyê Garisya ji Elaşgirê ye, ji gundê Garisya ye. Wate, meriv dikare vê varyantê wekî varyanteke ji Elaşgirê bihesibîne. Yekem varyanta Mem û Zînê ya ku ji Elaşgirê di sala 1903yê de bi kurdî hatiye berhevkerin û ji aliyê keşîşê ermenî G. K. Nzhdehian ve bo zimanê ermenî hatiye wergerandin (bnr. Chyet, 1991: 335-337), yek ji wan varyantan e ku taybetmendiyên giştî yên varyantên Serhedê di nav xwe de dicivîne. Herwiha, meriv dikare bibêje ku ev varyanta Nzhdehian (1903) û varyanta Kazoyê Garisya ku herdu jî ji Elaşgirê ne, ji pir aliyên ve du varyantên nêzîkî hevdu ne.

Îcrakirina destanê bi tena serê xwe hêjayî vekolînê ye û ew dişê gelek zanyariyan pêşkêş bike derheq paşxane û pêwenda destanê de. Rewşa performansê ji bo deqa berdest pêwendê giring e, ji ber ku şiyana vegêr û hal û hewalê wî/wê yê di dema performansê de û lê veğerandinên civata hazir û guhdar giş diqewime ku tesîr li deqa çîrok û stranê bike (Ben Amos, 1971: 5). Ji ber vê yekê, bi tevî bernivîsandina destanê, di vê xebatê de hemû xebirdanên di navberê de jî hatine nivîsandin û di çarçoveya pêwend û paşxaneyê çandî de hate nîrxandin. Di vê bernivîsandinê de ji modela Honko (2000) hate istifadekirin. Ji ber ku ev model zemîneke rêxweşker bo vê xebatê dabîn dike û di hêla ku meriv li ser bernivîsandina destanên kurdî û dînamîkên paşxaneyî yên performansan destanan bifikire. Kaseta ku dengbêjan dengê xwe dayê; ya ku bûye çavkaniya sereke ya vê xebatê, berî salan di arşîva min a taybet de cih digirt, piştî wextan beşeke wê ji aliyê çend kesan ve li platformên dijîtal hate barkirin lê di wan de hem beşa destpêkê hem jî beşa dawiyê kêm e.

Mem û Zîn wekî vegêraneke tîkel a helbest û pexşanê û çanda enstrûmanê

Destan ji aliyê îcrakarên xwe ve li herêmên cuda bi navên cuda tê terîfkirin: beyt, beyt-serhatî, kilam, kilama dirêj, kilama turaz, kilama qedîm, kilama mezin, mesele, hikaye, galgal, qîset, çîrok û hwd. Destanên kurdî bi piranî vegêranên dirêj in ku bi tîkeliya pexşan û helbestê pêkhatî ne (*prosometric*) û bi dirêjbûn, qalib û bi rêzerûdanên xwe yên çîrokî ve ji kilaman, bi taybetmendiyên xwe yên helbestî, enstrûmanî, îcrakarî û profîla guhdarên xwe ve ji çîrokan cuda dibin. Di destanên kurdî de wekî meyleke giştî beşên pexşanî nayê strandin û bi gelemperî bi vegêrana kesê sêyem tê pêşkêşkirin, berovajî wê beşên helbestî bi kilamî tîkên strandin û ji diyalog û monologên karakteran pêk tîkên. Li gorî herêman enstrûmanên cihêreng di îcrakariya destanbêjiya kurdî de peyda dibin. Bo nimûne, li herêmên wekî Berfîrat, Mêrdîn, Şengal, Cizîr û Badînan bi tevî enstrûmanê jî tîkên îcrakirin (ji bo enstrûmanên ku di muzîka kurdî de tîkên/hatine bikaranîn, bnr. Ehmed, 1989). Destan an jî “beyt, bi karaktera xwe ya hikayekirinê û dirêjbûna xwe ve ji stiranên lîrikên yê folklorê kurdî û herwesa bi stîrana forma helbestî ve jî ji çîrok û serhatîyan cuda dibe” (Kaplan, 2022: 12). Li ser rû-dinyayê di nav çandên cihêreng de epîk (destan/beyt) mîna nêrîta destanbêjiya kurmançî bi tîkelheviya helbest û pexşanê tê vegêran. Bo

² Heta nika, hemû varyantên Mem û Zînê nehatine destnîşankirin an jî di xebateke bibliografîk ji bo varyantên devkî nehatiye amadekirin. Vekolîna herî berfireh a li ser varyantên Mem û Zînê hatiye kirin a Chyet e (1991) ku li ser hejdeh varyantan e. Chyet li ser hemû varyantên ku wê hingê berdest bûye vekolîneke berfireh amade kiriye. Herwiha bo zêdetir varyantên heman destanê, bnr. Chyet (2020).

nimûne, vegêrana têkel a helbest û pexşanê ya nêrta destanên li Hindistanê û ya li nav çandên Asyaya Navîn (bnr. Reichl, 1997, 2022) berbelaviya vê cureya bi navê prosîmetrûm (*prosimetrum*) nîşan dide. Di çanda tirkî de jî cureyên menzûm û qismen jî pexşanî yên wekî *Danişmendname* û *Battalnameyê* ku di heman demê de xwe dispêrin çanda nivîskî û devkî gihiştine dema me vê taybetmendiyê nîşan didin (Lachenauer, 2022: 160). Helbet, eynî vegêran diqewime ku li herêmekê bi temamî wekî helbest, li herêmeke din bi şêwezarekî din; an bi têkeliya helbest û pexşanê, an jî bi demê re taybetmendiyên xwe yên dirûvî jî dest dabe û bi temamî wekî pexşan were vegêran. Ev guherîna di navbera du cureyan de (pexşan û helbest) dikare ji bo bandora deqî (*textual*) û ya tevî (*textural*) bête bikaranîn; dikare rê li ber vegêr xweş bike da ku têkiliyên di navbera xwe, karakterên xwe û guhdarên xwe de keşif bike (O'Donoghue, 2015: 7). Xeberdan û têkilî û minaqeşeyên li ser awa û şêwaza vegêranê yan jî varyantên vegêranê dîsa di wan navberên pexşanî (devkî)³ de tîpêşkirin ku pê re hizr û derbirînen şexsî yan jî herêmî jî bi beşên pexşanê ve dibin wekî parçeyekê performansê. Herwiha, *prosimetrum* imkanê dide ku vegêr an jî destanbêj (dengbêj, beytbêj, aşiq, şair, mitirb û sazband û hwd.) ku ew xisûsiyetên rabûn û rûniştina herêmî jî tev li performansê bike. Versiyonên Mem û Zînê (ya bi devkî) li gorî Chyet meriv dikare li ser du paran parve bike. Hin versiyon bi piranî helbestî ne, lê pîraniya versiyonan jî vegêranên pexşanî pêk tên ku di xalên giring de helbest lê zêde dibe; ev beş (ên helbestî) beşên herî stabîl ên çîrokê ne û wer xuya dike ku bi qalîban tîpêşkirin (Chyet, 2020: 2). Mem û Zîn bi piranî jî tîkelheviya pexşan û helbestê pêk tê, di vê derbarê de Atlı (2024: 495) destnîşan dike ku “tu varyantek ku bi tevahî menzûm be li ber destê me tune ye”. Di nav varyantan de ya ku bi piranî helbestî ye varyanta têkel a Lescot e, lê di wê de jî babeta binavkirina Mem bi pexşanî ye (Lescot, 2013: 27-28).

Di destan û beytên kurdî de, babeteke din a ku di navbera herêmên cuda de cihêrengiyê nîşan dide bikar(ne)anîna enstrûmanê ye. Bi giştî wer tî zanîn ku destanbêjên kurd destanên xwe bê enstrûman îcra dikin û ev fikr berbelav e. Di vê derbarê de Hassanpour (1989) destnîşan dike ku beyta kurdî berovajî hinkûfê xwe yê azerî *bi tevî enstrûmanê nayê îcrakirin*. Wer xuya dike ku Hassanpour ev yek ji bo awayê bêenstrûman ê deverên soranîaxêv yên li Îranê gotiye. Di xebata xwe ya li ser tesnîfkirina destanên kurdî de, Subaşî (2024: 106) jî nêrîneke nêzikî ya Hassanpour tîne ziman. Ji aliyê tarîxî ve dema meriv lê dinêre, tî dîtîna ku enstrûman çandeke zaf qedîm nîne li vîna deveran, lê dîsa jî vê yekê meriv nikare ji bo hemû deveran bibêje. Dema meriv li wêneyê berfireh dinêre, tî dîtîna ku çanda destanbêjiya kurdî bi qasî ku bê enstrûman tî îcrakirin, ew qas jî bi enstrûman tî îcrakirin. Bi taybetî, li Serhedê û derdora wê ya berfireh û xeta ku heta Mukriyan berjêr dibe bêenstrûmanî serdest e. Berovajî vê yekê, ji Efrînê heta Cizîrê û ji wir heta Behdînan û Şengalê û Hewlêrê li erdnîgariyeke berfireh bi tevî enstrûmanên cuda îcrakariya destanbêjiyê tî dîtîna. Eger meriv li ser Mem û Zînê nimûne bide, ji aliyê Serhedê kesên wekî Dengbêj Reso, Dengbêj Zahiro, Dengbêj Kazoyê Garisya, Dengbêj Şemsedîn û Dengbêj Mistefayê Cangoranê û hwd. Mem û Zînê bê enstrûman li ser qaîdeya kilambêjiya li Serhedê ya bê muzîk îcra dikin (bi seredorî bo îcrakariyên wan bnr. Güneş Müzik, 2020; Kazım Atlı, 2019; Ekrem Kaya, 2018; Kaniya Dengbeja, 2020, 2024). Li aliyekî din li Efrînê aşiq, şair û sazbandên vê herêmê yên wekî Henanê Evdê Şerê, Adîk, Mecîd Hemgulî, Bavê Selah û Xunav, Mihemed Welîd, Cemîl Horo, Omer Cemlo, Hesên Nazî û Mistê Zênkê (bnr. Jindires, 2022, 2022a, 2018, 2017, 2017a, 2017b, 2017c 2023, 2012; Şêrzad Efrînî, 2011; Stüdyo Nergîz, 2019), li Kobaniyê Baqî Xido (Dilnar music, 2021), li Şengalê Qasimê Meyro (Behary, 2022), ji berriya Mêrdînê Hesên Gulê (Berekat Özmen, 2023) û li Deşta Herîrê nêzikî Hewlêrê Hesên Sîsawe (Faesal Azez, 2019) û li Cizîrê Aşiq Selîmê Cizîrî (Berekat Özmen, 2018) û hwd. tev bi enstrûman Mem û Zînê dibêjin. Meriv dikare bibêje ku li van hemû herêmên ku kilambêjiyeke bi enstrûman heye, diqewime ku destan jî bi heman rengî hatibin îcrakirin. Hetta meqamên safî saz an jî tenbûr ên Mem û Zînê jî li Berfîratê bi hezkirin hatine guhdarîkirin (bnr. Perde, 2022).

Performans, Pêwend, Guhdar û Bernivîsandin

Pêvajoya veguhastina çanda devkî ber bi forma deqî karekî aloz û bihûrgilî ye, lewma jê re di hemû pêngavan de baldariyeke bidîqet gerek dike. Ev pêvajo ne tenê bernivîsandina peyvên derbirînekê

³ Dengbêj Kazoyê Garisya, helbestî û pexşanî wekî “kilamkî” û “devkî” kategorîze dike.

ye, lê di heman demê de ew hewldana bidestxistina cewher û pêwenda performansa devkî ye ku bi kûrahî di derdora çandî û civakî de ediliye. Honko û yên din (2000) destnîşan dikin ku meriv divê baldar û haydar be û fêhm bike ku hemû tercihên ku meriv ji bo pêngavên ji bernivîsandina derbirînên devkî ber bi dîktekirin, sererastkirin, wergerandin, weşandinê diavêje giring in û hin guherînên bingehîn di nav xwe de di hewînê û qedera derbirîna resen diyar dikin di naverok û forma dawî ya deqê de. Ji bo vî karê aloz û zehmet, Lauri Honko di kitaba bi navê *Textualization of Oral Epics* de ku ew tê de edîtor e, risteyeke wiha di destpêkê de dinivîse: “Bernivîsandina (*textualization*) epîkên devkî nemimkin e” (Honko 2000: vii). Qesta Honko ji vê risteyê ew e ku performansên devkî bi herf û peyvên ve nayên qefaltin, ji ber ku gelek taybetmendiyên derbirînê yên mîna dengên paralinguîstîk (*paralinguistic*), muzîk û îşaretên ku meriv bi livandina dest û milan an serûçavan dide nîşandan li derveyî kodîfikasyona vegêrana nivîskî dimînin. Prosesa baldar a bi sembola nîşandana hemû rehendên performansa devkî jî, duristkirinên wateyê yên navbermetnî û kakilê prosesa wergirtinê (*reception*) nikarin nîşan bidin. Bi ser de jî eger kêmasiyên zanyariyên derheq kevneşopê de hebin, bi yek carî kesê çavdêr ê xerib duçarî kêmasiyên dîtîne dibe. Jixwe deqa ku bi devkî tê veguhastin, dema dikeve nav form û derdankên nivîsê ango dema derbasî nivîsînê dibe, wê hingê dibe berhemek (*artifact*) (Honko, 2000:15-18).

Honko, di kitaba navborî de bi gotara xwe ya "Text as Process and Practice" (Deq wekî Pêvajoyê û Pratîkê) de modeleke pêvajoyî pêşniyaz dike ku Bender (2019) jê re dibêje “pêvajokirin” (*processing*). Ew di modela xwe de li ser ekolojiya tradîsyonê agahiyên bingehîn dide û bi pêvajoya pir-pêngavî ve, ew destnîşan dike bê ka divê deqeke ku xwe dispêre çandê dê çawa be serencama wê ya ji deng ber bi deqeke weşandî. Honko diyar dike ku şiyanweriya tematîk a îcrakar, eleqedarî û girêdana wî/wê ya bi hin cure û vegêranan, stratejiyên performatîf, stîla performatîf (*performative style*), rewşa performatîf û danûstendina dengbêj a bi cimaeta hazir û guhdar re (*audience interaction*) û gelek faktorên din tesîrê li ser performansê dikin (bo van faktorên bnr. Honko, 2000:17-35). Piştî vê yekê, paşxaneyê kesê ku qeydê tomar dike, metoda qeydê, stratejiyên sererastkirinê û weşandinê, pêwenda deqa ku hatiye qeydkirin hemû tesîra xwe hene li ser deqa weşandî ya ku ji nav tradîsyonê tê (*tradition-oriented*) (Honko, 2000:17). Bernivîsandinê pêvajoyek e ku Ready (2015:8) wê wekî “afîrandina deqeke nivîskî ya ku xwe dispêre qeyda performanseke devkî” pênase dike. Lewma, heger bernivîsandinek bi baldarî bê kirin, dikare têkiliya di navbera dengbêj û guhdaran de, şiroveyên dengbêj ên li ser destanê yan jî li ser varyantên wê an jî rewşên din ên têkildarî pêwenda performansê diyar bike. Ev çend deh salên dawî ye, xebatên têkildarî heyata dengbêjan û bernivîsandina kasetên wan (kilam û destan) her diçin zêde dibin, lêbelê ev xebat bi piranî kilam û destanan ji pêwenda wan a civakî, çandî û dîrokî îzole dikin an jî hin caran ji hin parzûnên zimanî û fikrî re derbas dikin. Di piraniya van xebatan de meriv rastî xebardanên dengbêj ên di navbera kilam û destanê de nayê ku ev xebardan û tevkariyên guhdaran derheqê ekolojiya vî nerîte de agahiyên pêwîst didin.

Ji bo rewşa berhevkarîya kilam û destanên kurdî, tê dîtîna ku kêmasiyên rê û rêbaza bernivîsandinê û têkelkirinê an jî midaxleyên zimanî yên destana û kilaman hene. Meriv dikare gelek bi rihetî rastî deqên nivîsandî yên destanên devkî bê ku ji têkelhevkirina performansên destanbêjên cuda cuda hatine duristkirin bo deqeke xurttir (Lescot, 2013; Kaplan, 2019a, 2019b) an jî destwerdanên zimanî û edîtorîyal (Timar, 2021a, 2021b; Hemkoçer, 2012) li ser çêdibin. Di van hewldanên berhevkarî û bernivîsandina destanan de, daxwaza duristkirina metna kamil/rajor an jî metna îdeal (*master text*) perçeyên ji varyantên cihêreng tîne ba hevdu da ku bi wan metneke sergihayî bê sazîkirin a ku di hişê kesê îcrakar bi xwe de nîne. Bi alîkariya têkelkirina deqên cihêreng pêkanîna metneke kamil karekî berbelav bû di sedsala borî de (bnr. Honko, viii, 46; Bender, 2019), lê rê nade ku xebatên li ser varyantên destanê pêk were ji ber ku ev metnê dibe metneke wiha ku meriv dikare nivîskar an jî berhevkar li kêleka dengbêj wekî kesekî wisa bifikire ku di hev-afîrandina (*co-creation*) metnê de keda wan pêkve ye (bo vî babetê bnr. Bender, 2019). Li vir çend nimûne dê bînin pêşkêşîkirin, lê di hin nimûneyan de (bi taybetî, Kaplan, 2019a, 2019b) ihtimal heye ku berhevkar xwestibe metneke kamil û sergihayî ji bo xwendina giştî berdest bibe. Ji ber ku nimûneyên destwerdana li ser berhevkarîyên folklorîk zêde ne, li vir em dê tenê behsa çend çavkaniyan bikin. Eger em nimûneya ewil li ser bidestxistina metneke

kamil/rajor bidin, di destpêka kitaba *Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn* de Kaplan rê û rêbaza xwe ya bidestxistina destaneke “birêkûpêktir” û “xweştir” agahîyan dide û em jê hîn dibin ku wî çawa Dimdim ji dengbêj û beytbêjên cuda aniye ba hevdu:

Me ev destan ji deh dengbêj û beytbêjên cuda yên devera Hekariyan tomar kir. Pêşiyê me dengên wan qeyd kir û paşî jî ev qeyd deşifre kirin. Ji ber ku ev dengbêj û beytbêje hemî yên deverekê bûn, di navbera varyantên vê destanê da cudahiyan pir hindik hebûn. Lêbelê van varyantên cuda hemîyan, hevdu temam dikirin. (...) Hinek hûrgiliyên li cem varyantekê heyî dibû ku li cem ya din nebe. (...) Lêbelê dema me ev varyantên cuda hemî li ser hev kom dikirin, vê çendê honak û rista bûyeran ya destanê birêkûpêktir dikir. Bi saya wekî yek destan komkirina van varyantan gîvilê (sîlûet) destanê xweştir xuya dikir (Kaplan, 2019a: 12).

Xebata Roger Lescot a bi navê *Memê Alan* ku yek ji deqa herî navdar a li ser destanê ye, ji metneke têkelîya varyantên cuda yên dengbêjan pêk tê ku li ser bingeha varyanta Mişo ava bûye (Lescot, 2013 [1942]:9). Chyet, ji ber berhevdana metneke kompozît bi dirêjî Lescot rexne dike ji ber ku wî jî eynî mîna Birayên Grimm destwerdanek li ser metnê çêkiriye û ew metnê edî nikare temsîla çanda devkî ya resen bike (bo nixandineke dirêjtir li ser berhevkarîya Lescot, bnr. Chyet, 1991:16-23). Varyanta Lescot a mudaxelekirî “qîmeta wê ya ji bo lêkolînên zanistî kêm dike” (Atlı, 2024:495). Bi giştî meriv dikare bibêje ku di kurdî de jî di berhevkarîyan destanan de metnên kamil (*master text*) tên dîtin û ev yek reseniya metnê xerab dike û nixê wê yê resen kêm dike. Di hin berhevkarî û bernivîsandinên destanên kurdî de, meriv tê dernaxe bê ka kesê ku destan nivîsiye çi destkarî li ser deqa nivîskî ya destanê pêk aniye. Kitabên berhevkarîyê yên Fettah Timar (2021a, 2021b) ên bi navê *Destanên Kurdî I* û *Destanên Kurdî II* ku heta radeyeke diyar e destkarîyên zimanî li ser hatine kirin, bi vî rengî ne. Nivîskar destnîşan nake bê ka çavkanî û materyalên wî çi bûn (dengbêj, kaset, CD) an jî heta çi radeyê çi midaxeleyan (rê)zimanî lê kirine. Berovajî vê yekê, hin nivîskar û berhevkarên kurdî di destpêka kitabên xwe de rê û rêkarên xwe destnîşan dikin û behsa destkarîyên xwe dikin ku bi wan metna destanê “bedewtir” dibe:

Min berê serpehati bi pirranî çawa ku hatibû gotin nivîsand, lê hinek guhertinên bi sînor pêwîst bûn, bi armanca zelalkirina wateyê, serrastkirina hinek gotinan, duristkirina rêzimanîyê ta radeyekê, danîna berdêlên Kurdî bo peyvîne biyanî yên ne pêwîst û bilindkirina radeya destanê ya wêjeyî. Hinek hevokên ku bêyî pêdivê pê hebe li şûnên cuda hatibûn zêdebarekirin ji aliyê min ve hatin rakirin. Bi encamê heye ku ev babetê li jêr piçekî ji kopya ku min sal 1987 bi daktîlo nivîsandibû cuda be. Bi dîtina min, babetê di vê pirtûkê de ji bo wêjeya kurdî, ji bo kalîteya serpehatiyê, û heta ji bo navê Baqî Xido jî bedewtir û bêtir sûdmend be (Soreklî, 2019: 6).

Ev jêgirtina li jor ji kitaba bi navê *Destana Dewrêşê Evdî* ye ku Baqî Xido (1918-1995) îcra kiriye û Şahîn Bekir Soreklî jî dengê wî destan derbasî nivîsê kiriye. Hêjayî qalkirinê ye ku ev varyant di heman demê de bi awayekî berfireh û serkeftî hatiye nixandî û wergerandin ji bo îngilîzî (bnr. Sträuli, 2017). Hin ji destwerdanên berbehs, dibe ku ji aliyê berhevkaran ve bi zanebûn hatibin amadekirin ji bo xwendina giştî ya civaka kurdî hêsantir bibe (standartkirin) yan jî metneke kamil û dirêj berdest bibe (têkelkirin). Lêbelê, di hin berhevkarîyan de an jî di bernivîsandinên ji kasêtên destanbêjan de, meriv dibîne ku ji bilî destwerdanên li ser zimanê devokî, lêanînen berhevkar ên di destanê bi xwe de, destwerdanên têkildarî hêmanên dînî jî rû didin. Bo nimûne, di kitaba bi navê *Berîvana Cindî* de Hemkoçer (2012) ku di ser bergê kitabê de rola wî ya berhevkarîyê wekî “komkirin û lêkdan” hatiye destnîşankirin, destwerdanan li ser hêmanên dînî dike. Hemkoçer, di beşên ku destanbêj bi gotinên kêmkirinê behsa jinê dike an jî behsa Xwedê, pêxember, Qur’an û têgehên din ên dînî dike, an jê derdixe an jî diguherîne û vê yekê di bernivîsandina hemû destanan de pêk tîne. Ji ber vê egerê, meriv nikare lêkolîneke (rê)zimanî, zimannasiyê an jî folklorîk li ser berhevkarîyên wî bike. Li jêr nimûneyeke biçûk ji performansa Destana Ezîzê Tek Mîstefê ya Reşîdê Mem Çûcanî (1924-2013) heye ku heman qeyd hem ji aliyê Celîlan ve (Celîl & Celîl, 2014: 247-284) hem jî ji aliyê Hemkoçer (2012: 17-41) ve hatiye bernivîsandin:

Xude dînê dînenê, mala E'zîzê T'ek Mîstefê telaî bi t'enê,

Se r'o sê şevane bavê kal destê xa k'işandî ji qulp û dîrakê dinê,
 Serî xa dîna kêlê kevirî, axê gor'nê,
 Vê bavî kal, kekê, sebir û dîşlix qe nêê,
R'akirî, dîgo: k'itabê Qura'nê, yasînê,
Qor' bi gor' pêr'a der'ê û tê li morantya sibê,
 Li yanî h'ewlê bal û zênê xa didê,
 Kekê, sikinîyaê zok suwar hewarê *Xudêo*,
 Mîmane qeyasê dewletê, gi ewa li yanî h'ewlê,
 Bervê der'ê, bal û zênê xa didê, Bek'ir-beg û Sileman-begê (Celîl & Celîl, 2014:249)

Xwedê dînê dînenê mala Ezîzê Tek Mistefê
 Kure şanzdeh salî, telayê bi tenê
 Sê roj in, sê şevin e, bavê xwe bar kirî ji diyarî dinê
 Serê xwe dînayî kêla kevirî û axa gornê
 Beyî bavê xwe sebr û dîşliqa Ezîz qe nê
 Li yanî hewlê bal û zêna xwe didêyê zoyek siwar xuya tê mîmanî qiyasî li yanî hewlê
 Ber bi wan diçê, bala xwe didê yê yek Sileman beg e, yek Bekir beg e, herdu kuren apê (Hemkoçer, 2012:21)

Li jor heman benda ji Ezîzê Tek Mistefê ji aliyê du kesan ve hatiye bernivîsandin. Birayên Celîl bêyî ku tu guhertinê bikin, bi rêbazeke ilmî destan (ber)nivîsandine, berovajî vê, Hemkoçer cih cihan destan bi gotinên xwe şirove kiriye û bi ser de jî gelek hêmanên dînî ji nav destanê derxistiye ku hin ji wan qalibên qedîm ên destanan in. Bi giştî meriv dikare bibêje ku di berhevkarî an jî bernivîsandina destanên kurdî û helbet cureyên folklorê kurdî yê din de heman kêmasiyên rê û rêbazê tên dîtin. Herwiha, ev cure destwerdanên têkildarî hêmanên dînî (*religious allusions*) di nav bernivîsandina destanên mîletên din de jî tê dîtin. Bo nimûne, Reichl (2022: 59-60) destnîşan dike ku di dewra Sovyetê de, di destanên uzbekî de destwerdanên edîtoryal ên radîkal tên dîtin ku têkildarî hêmanên dînî, zayendî û serxweşiyê ne.⁴

Tekstualîzasyona destanekê bi tena serê xwe karekî giran e û eger performans ji aliyê vekolîner û kesê çavdêr bi xwe ve nehatibe girtin, wê hingê rewş ji ber sedemên cihêreng aloztir dibe. Varyanta Memo û Zînê a ku berdest e ji bo vê xebatê, ji ber ku di pêwendêke rewşa tabîî de hatiye tomarkirin, ji aliyê guhdar û kesên hazir ên dengbêj ve xwedî paşxaneya performanseke resen a dengbêjan e. Di vê varyantê de têkiliyên eqrebatîyê, midaxele û mizakereyên dengbêjên din û nîqaşên li ser varyantan cih digirin. Lewma, çiqas ji destê me hat, me anî di vê bernivîsandina ji kaseteke teybê de hemû xeberdan temsîl kirin û pêwenda performansê ya rewşî ji xeberdanên civata guhdar û dengên paralînguîstîk îzole nekir. Bi vê nêrîne, me anî hemû xeberdan, reaksiyon, sererastkirin û pêşniyaz û midaxeleyên ku meriv dikare bi rêya deng bibihîze, nivîsî da ku paşxane û pêwenda rewşa performansê baştir bê fêmkirin û zelalkirin. Helbet meriv di vê derbarê de çiqas lê bixebite jî deqa nivîskî dê nikaribe bûyera ku di pêwenda performansê de pêk tê mîna bûyera bi alîkariya deqê avabûyî temsîl bike; dê tim valahiyekê di navbera wan de hebe:

Mimkun e gelek aliyên performansê di bernivîsîneke bi baldar û hûrgilî de were parastin. Bi arîkariya tomarên deng û vîdyoyê pir ji dînamîkên performansê devkî dikare were girtin, û şirove û analîzên din ên ji hêla beşdar û çavdêran ve dikarin hin valahiyên di belgeyên me de dagirin. Vegirtina bernivîsandinê ya herî berfireh jî, dê nikaribe wê valahiya di navbera herdu bûyera de dagire, yek bûyera ragihandinê û ya din bûyera ku jinûve tê avakirin bi awayekî medyatîk û metnî (Reichl, 2022:63).

Metna ku dikeve reng û rûyê cîhana nivîskî û bi şêklên wê digire dê helbet temsîleke kamil a ji performansê xwe ya tabîî negire. Ji ber ku kar û xebata dengbêj a di performansê de di valahiyekê de

⁴ Babeta destwerdanê babetêke giring e û hêjayî vekolîneke berfireh e di kurdî de. Lewma ev behs dê li vir zêdetir dirêj nebe.

pêk nayê (Honko, 2000: 26). Xeberdan û reaksiyonên guhdaran û hemû ew atmosfera ku rewşa tabîi ya îcrakariya dengbêj dabîn dike hêja ne û divê neyên paşguhkirin.

“Memo [û] Zînê”⁵: Nirxandina Paşxaneya Çandî û Tevkariyên Guhdaran

Varyanta Memo [û] Zînê ya ber destê me, wekî ku li jor jî hate destnîşankirin, di demeke nediyar ya di navbera salên 1980 an jî 1990î de li navenda Agiriyê hatiye tomarkirin. Wê şevê, xêncî guhdar û mêvanên dawetê, çend kesên dengbêj jî li wir hazir in. Yek ji wan Dengbêj Dursin e ku xwarziyê Kazoyê Garisya ye, yê din jî Dengbêj Fesîh⁶ e ku birayê Kazo ye. Kesê ku jê re kaset tê tijîkirin jî Mihemed Nurî ye. Bi piranî, Kazoyê Garisya Memo û Zînê gotibe jî di destpêkê de di çend bendan de Dursin jî tev li îcrayê dibe. Her yek ji wan dengbêjan berde wama yê din dibêje û terz û meqamên wan dişibin hevdu, herçiqas gotinên wan neşibin hevdu jî. Di nimûneya li jêr de risteya destpêkê ya ku di hemû varyantan de teswîra mezinbûna bajarê Muxuribiyên dike ji aliyê herdu dengbêjan ve wiha hatiye gotin:

Dengbêj Dursin: dibê [...] bajarê hanê bajarê Muxuribiyane

bajarekî pir mezin e [û] pir qîmet û pir girane

li ser sêsid û şêst û şeş koşane

Dengbêj Kazo: dibê ca sêr bikin şehrê Mixurya şhrekî girane

şehrê Mixurya sêsed goze ne her gozekî şesid xane

Çawa ji performansa herdu dengbêjan jî diyar dibe, tercîhên wan ên peyvan ên wekî “bajar” û “şehr”, “koşe” û “goze” û hwd. ji hevdu cuda dibin, lêbelê bi giştî deng û meqamên wan wisa dişibin hevdu ku kesekî ku bala xwe nede xeberdanên di navbera destanê de dê ferq neke ku di destpêkê de du dengbêj dibêjin. Xêncî kaset berdest a di arşîva me ya taybet de cih digirt, me ji agahiyên ji kasetên din jî istifade kir. Helbet di nav kasetê bi xwe de jî me tê derxist ku kaset ji bo dawetekê hatiye dagirtin li mala Mihemed Nurî (Nurettin Özdemir) li navenda Agiriyê (Qerekilîs), lê me tarîxa tomarkirina kasetê bi dest nexist. Dengbêj di xeberdana xwe ya di nav performansa xwe de vê yekê wiha destnîşan dike:

[Guhdarek] : Welleh eva jî *hedîyakî girane* xalo.

[Guhdarekî din] : Lê lê.

[Kazoyê Garisya] : Ji bona xatirê Miheme Nurî, em niha hatine mala wî. Him xinamiyê me ye, him jî ximantî me diha teze kiriye. Xudê silametiye bidê. Me jê ra *sê band* tijî kiriye. *De êdî dide nade*, kêfa wî ye.

[Mihemed Nurî] : Xudê ji te razi be, Xudê şerefa te zêde ke însalla.

⁵ Ji ber ku li cografyayeke berfireh belav bûye, varyantên Mem û Zînê derketine meydanê ku ji herêm û şêwezarekî heta herêm û şêwezarekî din guherînan berçav nişan dide lê binyad an jî kakilê destanê kê-m-zêde di navbera van cihêrengiyên de hevpariyê nişan dide. Di serî de di navê destanê bi xwe de guherîneke biçûk xuya dike ku me li gorî wê nav li vegêranê kir wekî “Memo [û] Zînê”. Ji ber ku di nav vegêranê de Dengbêj Kazoyê Garisya bi qasî sed û sî carî dibêje Memo û qedera sed carî jî dibêje Memoyê Alan me çêtir dît ku em navê karakterê sereke wekî “Memo” binivîsin ne ku Mem. Herçiqas guherîneke berçav û mezin nebe jî me xwest em bi vegêranê re li hev bikin. Herwiha dengbêj bi xwe navê vegêrana xwe nabêje, wê wekî “Mem û Zîn” bi nav nake, lewma me herdu nav anîn ba hevdu û [û] lê zêde kir. Wate, navê “kilam”ê ji ber ku di nav destanê de derbas nabe me “û”yek danî navbera navên “Memo”, “Zînê”: “Memo [û] Zînê”

⁶ Fesîh bi xwe di hin performansên Kazoyê Garisya de beşdarî kiriye û bi tevî birayê xwe kilam gotiye.

Ev xeberdana di navbera kasetê de tam jî di wê sehneyê de çêdibe ku tê de perî Zînê tînin datînin cem Memo. Li vir guhdarekî nenas [ihtimal xwarziyê Kazo yê bi navê Alay e] ji îfadeyên ji bendên berîn ên destanê digire ku ji bo Apê Memo tê gotin: “îsal çend sale Memo hatiye dinyayê jê ra nestandiyê hediyakî girane”. Hedîye ango xelata ku Apê Memo jê re distîne “kurîbehran” (Boran), lê hediyeya ku Dengbêj Kazoyê Garisya ji bo xînamiyê xwe Mihemed Nurî dide, îcrakariya Memo û Zînê û tevî wê çend kilamên din e ku ji bo cîmaetê jî “hedîyake giran e”. Piştî vê gotina guhdar, dengbêj behs dike bê ka ji bo xatirê kê “sê band”an tijî dike û diyar dike ku ev banda sisiyan e ku tijî dike, ango em tê derdixin ku dengbêj ev sê-çar saete kilaman dibêje. Di dawiyê de dengbêj bi rengekî sergirtî (naxwaze zêde eşkere bike lê cîmaet têdigihê) heqdestê xwe ji xînamiyê xwe hêvî dike bi gotina “êdî dide nade, kêfa wî ye”. Ev xeberdan jî nîşaneyê wê yekê ye ku dengbêj bi kilaman û bi tijîkirina kasetan debara xwe dike û miqabilî hediyeya xwe ya giran, heqê xwe hêvî dike. Ji îcrakariya dengbêj û ji xeberdanên wî tê dîtin ku ew îcrakirina xwe li gorî rewş, pêwend û tîkiliyên civakî/xizmî araste dike û li hev tîne, carcaran diguherîne û nîqaşa versiyon û awayê vegêranê dike, carcaran jî bi guhdaran re derveyî îcrakariya destanê xeber dide.

Di dema performansê de beşên pexşanî ên vegêranî ji aliyê dengbêjan ve bi awayekî fesîh û bi terzeke hêdî ya nêzî xeberdanê tê derbirîn. Bi gelemperî piştî beşên helbestî an jî belkî bi gotineke deqîqtir kilamî bi bêhnvedanên kurt beşên pexşanê dest pê dikin ku ev yek jî taybetmendiyêke giştî ya van cure vegêranên kurmançî ye. Memo û Zînê ya li ber destê me ji aliyê tevkarîyên guhdaran û derdora tabîî ya cîmaetê cudatir e ji ya Dengbêj Reso (1932-1988), Dengbêj Zahiyo (1944-) û ya Dengbêj Şemsedîn. Qeydên navborî bi temamî ne profesyonel bin jî bi qasî qeyda Kazoyê Garisya derdoreke bi cîmaeta hazir û guhdar dagirtî nîne yan jî guhdar ew çend zêde xeber nadin. Ji ber vê taybetiya xwe, midaxele, sererastkirin, şirove û reaksiyonên hestî yên guhdaran, dengên paralinguîstîk tê de cih digirin ku bi vî rengî deqeke nisbeten adetî û performanseke li gorî dem û pêwenda xwe derdikeve meydanê. Di vê derheqê de guhdar û dengbêj jî di wê ferqê de ne ku dengê wan tê tomarkirin û bi rêya teyîba ku li wir vekirî, dikeve nav qeyda kasêtê. Di qeydê de Dengbêj Kazoyê Garisya, Dursin teşwîq dike ku heta beşa ku Zînê cem Memo destanê berdewam bike, lê Dursin dibêje ew dê ew qasî (hetanî beşa ku Zînê ba Mem) nikaribe bibêje:

[Kazoyê Garisya] : Derbas ke. Keçikê jî bine, paşê [bisekine]

[Dengbêj Dursin] : Keçikê bînim êdî temam e

[Kazoyê Garisya] : De tu hela bêje hetanî wira, tu diha xaş dibêjî

[guhdarkê bi gazin] : Xeberdan zêde nabe

Guhdarkê jî tê de dibêje “xeberdan zêde nabe” û bi bîra cîmaetê û dengbêjan tîne ku dengê wan tê tomarkirin. Xeberdanên di nava kasetan de zêde nayên xwestin, ji ber ku kaset di nav xelkê de belav dibin û bi hezaran kes wan dangan guhdarî dikin. Bi taybetî, ew kasetên ku dengbêj li mal, otel an jî di studyoyeke nisbeten bêguhdar de qeyd dike, bi armanca belavkarîyên ticarî, tê de zêde xeberdan nayên xwestin. Lêbelê ji ber rewşa tabîî ya performansê û ji ber asta tîkiliyên xurt ên dengbêj ku bi cîmaetê re daniye, dema ku piştî Memo û Zînê di cihekî de dixwaze xeber bide, wiha dibêje: “eva herdu kelîma jî de tişt nake, zerara wê tîne”. Kesê ku kasêt jî bo wî xusûsî tê tijîkirin Mihemed Nurî jî piştgiriya didê û dibêje bira “canê te sax be, te çi gotiye bêje”. Di xeberdana xwe de behsa serhatiyêke xwe dike ku çawa ji Elaşgîrê ji dawetekê teze diçe mala xwe ya Xamûrê, mêrikekê tê pêşiya wî da ku wî bibe ji bo dewata wan. Bêyî ku here mala xwe ji wir diçe daweta din, ji ber ku eger kilama nebêje dengê wî dikeve, di rê de ji wan re kilamêke dibêje. Kesên guhdar ecêbmayî dimînin û dibêjin me “sê sondê qesemê herge me vê kilamê tu zamanî bihîstiye”. Mihemed Nurî jî piştî ku guh dide vê serhatiya dengbêj û dibêje, “de bêje hela ci ka çi kilam e”. Çawa ku ji nimûneyan jî tê dîtin, cîmaeta hazir û guhdar dibin “parçeyên aktîf ên îcrayê” û “îcra li gorî mahiyeta dîwanê an jî civatê” diguhere (Atlı, 2024: 492). Di nav dengbêj

û nas û dostan de, dengbêj bi rihetî tevdiğere û xeberdanên xwe yê di navberê de li gorî vê yeke areste dike.

Li aliyekî din hebûna dengbêj û guhdarên ku destanê nas dikin ji bo îcrakariya dengbêj mihtemelen stresê jî zêde dike. Ji ber ku Dursin an jî kesekî din li derekê dixwazin bibêjin ku te xwe şaş kir lê Kazo vê yekê qebûl nake û dibêje “ew ayrî”.

[**guhdark**] : Heyran na wê çaxî mîr [...]

[**Dengbêj Kazo**] : De hela bise, tu bê destmal radixin, ew ayrî

Ev midaxele destnîşan dike ku cimaeta hazir û guhdar kê-m-zêde aşinayê Mem û Zînê ne û berî wextan jî guhdarî kirine. Îcar dema ku guhdar bi yek carî midaxeleyî performansa dengbêj dikin, dengbêj xwe ji bîr dike ku çend ferdên destanê bibêje. Dema ku li ser gotina xwe ya jibîrkirî difikire ji bo ku hinekî raweste risteyeke ji destanê bi dengê nizm dîsa tekrar dike: “Dibê ma Zînê û Rihan.”

Dibê ku derbas dibin. Memo ber pencerê ye sêva xu ji yekî jî naxe. Kê ma kê nema? Dibê ma Zînê û Rihan, cariya wî. Dibê ma Zînê û Rihan.

[**Kazoyê Garisya**] : Me ji. Ferdek dudu gere [bigota]. Ma, me nego.

Piştî dikeve wê ferqê ku çend ferd ji bîr kiriye van gotinên li jor dibêje bi maneya “Me ji bîr kir. Gerek me ferdek dudu bigota lê me negot”. Çawa ku tê dîtin ber û paşîya performansa dengbêj bi reaksiyon û midaxele an jî handana guhdaran ve diguhere. Li gorî cimaeta nas û dost, dengbêj di kasetê de bi rihetî navberên kurt dide îcraya xwe, carcar xeber dide an jî serhatiyeye xwe bi cimaetê re parve dike. Dengbêj li ser kurtkirin/dirêjkirina vegêranê teserufan dike û ber bi dawiyê dibêje “Eva *kilama* zaf dikişîne. Kêfa wî ye. Yalaniz heta vira bes e”. Ji ber ku guhdar Mem û Zînê baş dizanin, carcar dengbêj hin bend û beşan bi kurtî dibêje, ev jî dibe sebeb ku kesên ku ne nasê vegêranê ne temamiya wê baş fêm nekin (bnr. Foley, 2000: 83). Ev xalên bingehîn ên aidî performansa dengbêjan ya tabî di piraniya xebatên bernivîsandina arşivên dijîtal û kasetan de nayên nivîsandin û dîtin. Ev yek hin xalên giring ên çand û hunera kurdî ya devkî dide windakirin. Kaset divê di çarçoveyeye giştî de wekî berhemeke sergihayî were qebûlkirin û miameleyeke baldar pê re bê kirin an na hêlên giring ên performansa dengbêj û tevkeriyên guhdaran ku rehendên giring ên vê çandê nayên bihîstin û bidestxistin. Ev çend salên dawî gelek xebatên li ser arşivên kurdî yê bideng tî çêkirin, mixabin piraniya van xebatan kilam û destanên dengbêjan ji pêwenda wan a çandî, civakî û dîrokî îzole dikin (bo nimûne bnr. Güneş & Şahin, 2019a, 2019b, 2021, 2023; Berbir, 2007). Ji bo nirxandineke li ser xeberdan û diyalogên (hêmanên dermetnî) di nav kasetên dengbêjan de, di çarçoveya têgeha paratekstê ya Genette (1997 [1982]) de, bnr. Delikaya (2019).

Dengbêj û Destanbêj Kazoyê Garisya (1925-2005)

Elaşgir (bi tirkî, *Eleşkirt*) navçeyeye Agiriyê ye ku ji aliyê çanda dengbêjiyê ve mîraseke bi tîra xwe xurt hiştiye. Gelek navên mezin, di serî de jî Evdalê Zeynikê bi demeke dirêj li vê navçeyê maye û tesîr li dengbêjên hevçerx û peyrewên xwe kiriye. Ji ber ku dîwana ku Evdal tê de dengbêjî kiriye, *dîwana belek*, li gundê Kelê⁷ (*Toprakkale*) yê Elaşgirê bûye ku li wir Surmeli Memed Paşa hukim dikir. Navên wekî Zibête Qîrika (1883-1970), Hecî Sêvdînê Remedana (Sêvdînê Hamê), Arifê Silo (1895-1965), Seîde Qîrika, Üsivê Mihacir, Îbrahîmê Sarê, Mele Qesîmê Çatkosedaxê û gelek kesên din bûne nûnerên serkeftî yê çand û hunera kurdî ya devkî li vê navçeyê. Kazoyê Garisya (1925-2005) an jî bi navê xwe yê fermî *Kazım Kaya* di sala 1925ê de li gundê Garisya (bi tirkî *Oklavali*) tê dinyayê ku ev gund li Deşta Elaşgirê dimîne. Ew di temenê xwe yê biçûk de dest bi kilamgotinê dike. Hê di zaroktiya xwe de bi dengbêj û civatên dengbêjan re hevnas dibe. Bavê Kazoyê Garisya, Arifê Silo (1895-1965), û diya wî

⁷ Ev gund berê navenda îdarî ya navçeyê bû.

Nîgara Mehmûdê Şûşe (1895-?), jî dengbêjên têra xwe xurt bûne. Kazo hunera dengbêjiyê ji bavê xwe negirtiye. Helbet wî ji bavê xwe jî istifade kiriye lê zêdetir ew li ber destê Mistefayê Çiftborî perwerde bûye, piştî ku Mistefayê Çiftborî bi rehma Xwedê şa dibe ew dibe şagirtê Zibêtê Qîrika (Öz, 2003: 98) ku her du jî ligel Dengbêj Mistefayê Xelê Heyran dengbêjên herî navdar ên li Elaşgirê⁸ bûne (Aras, 2007: 234-235). Mistefayê Çiftborî zaf ji dengbêjiya Kazo hez kiriye û gelek caran pesnê wî daye. Tê gotin ku Kazo para mezin ya sermiyana xwe ji Mistefayê Çiftborî hildaye. Dengbêj Kazoyê Garisya li gundên Dešta Elaşgirê û Agiriyê ji bo dawet û şahiyana hatiye vexwendin û li gelek dîwan û dawetan bûye mêvan û ji guhdaran re kilam gotine.

Kazoyê Garisya li ber destê dengbêjên hemçaxê Evdalê Zeynikê mezin bûye, sermiyana Evdal a dewlemed wergirtiye û bûye yek ji wan çavkaniyên hin kilamên Evdalê Zeynikê ku Ahmed Aras hê di salên 1970 û 1980yî de ji wî berhev kiriye (Aras, 2018 [1996]). Wî bi tevî Dengbêj Şakiro, Dengbêj Seidê Qîrika, Dengbêj Nuroyê Meter û gelek dengbêjên din kilam gotine. Ji ber afirineriya wî ya kilaman û sermiyana wî ya xurt hin dengbêjên wê dewrê pê re neketine lecê. Kazoyê Garisya wextekî bi tevî Dengbêj Reso jî kilam gotiye, lêbelê wê demê Reso êdî kal bûye. Bi sedan kilamên wî hene û herçiqas kalîteya dengên kasetan zêde baş nebe jî bi dehan kasetên wî di nav xelkê de peyda dibin. Kazoyê Garisya herçiqas bi dengbêjiya xwe ve navdar bibe jî, wî di heman demê de destanbêjî jî kiriye. Destanên wekî Memo û Zînê, Derwêşê Evdî, Ahmed Begê Kela Boşatê (Yusif û Ezîz), Sedûn û Hakarî, Mengene, Elî û Seyrê, Çilosman, Xezala Mendal Axa, Heso û Nazê û Xelîl Beg îcra kirine. Lê meriv dikare bibêje ku ew herî zêde bi kilamên şer û bi taybetî yên li ser Seyîdan û Berazan ve navdar bûye. Li gorî agahiyên ku ji nav kasetên wî derdikevin, wî hin kilam ji ber xwe derxistine û bi dengbêjên din re ketiye lecê. Leca wî ya bi jineke bi navê Fadîle re di nav xelkê de navdar bûye, di kilama bi navê “Rezîlo Pale” de ew û Fadîle kilaman davêjin ber hevdu.

Li ser Rênivîsê Çend Nîşe

Ji aliyê ortografiyê ve, me alfabe ya kurmancî ya standart tercîh kir, ne transkîba fonetîk (*phonetic transcript*), lê me cihêrengiyên bilêvkirinê yên peyvan li ser awayên wan ên standart nenivîsand. Wate, kême cihên ku me kevaneka çarçik [] bi kar anî, gotin ne aidî dengbêj e, bo fêmbariyê me lê zêde kiriye. Wekî din di parçekirina bendên destanê de me bêhnvedanên dengbêj û guhdaran, xebardan û midaxeleyên wan esas girt. Çawa me berê jî gotibû, beşên helbestî ku bi piranî ji diyalogan pêk tên ji bo parçekirina bendan wekî esas hatin qebûl kirin. Helbet ji aliyê taybetmendiyên xwe yên dirûvî ve destanên kurdî xwedî hin xalên hevpar û qalibî yên destpêka bendan e ku di Mem û Zînan de ev yek gelek caran bi qalibên têkildarî dil ve tê çêkirin. Me navberên biçûk dan van bendên ku bi “dîlê mi yan e” û hwd. dest pê dikin. Ji hevcudakirina risteyên helbestî de ku Honko (2000: 31) jê re dibêje xêza/dêra helbestî (*poetic line*), me bi giştî qafiyeya dawî esas girt. Herwiha ferd û risteyên ku ne aidî destanê bi xwe ne, yên ku ji aliyê dengbêj ve di nav destanên de hatine gotin di navbera -...- de hatin nîşandan. Peyva “min” gelek caran wekî “mi”, hin caran jî wekî “min” dihat bilêvkirin, me li gorî bilêvkirina dengbêj carcar wekî “mi” carcar jî wekî “min” bernivîsandin. Herwiha, me cînavka “xwe”yê li gorî telafûza dengbêj wekî “xu” nivîsand. Çawa ku tê zanîn, wekî qalibekî, qafiyeya Mem û Zînê bi gelemperî bi “-ane” diqede, ligel çend beşên ku bi qafiyeyên cuda ve diqedin. Ji berê de, meyleke berhevkar û bernivîskaran heye ku “-ane” bi peyva berî wê ve dinivîsin, jê cuda nakin. Me jî ev rê tercîh kir. Me xalbeldî tenê ji bo beşên pexşanî bi kar anî, me beşên bi helbestî bi xal nekirin. Herwiha, çawa ku berê jî hatibû îşaretkirin, danûstandina guhdaran (*audience interaction*) û diyalogên di navbera dengbêj û guhdaran de (bnr. Honko, 2000: 26-27) hemû hatin bernivîsandin. Piştî Memo [û] Zînê kaset bi xebardan û kilambêjiyê dewam dike, lê ji ber ku babeta sereke bi destanê re hatibû sînordarkirin ew beş nehatin bernivîsandin. Wekî gotina dawî di metna me bi xwe de jî cih cihan ji ber qalîteya deng hin gotin nehatin fêmkirin û nivîsandin, wate metna berdest jî ne bêqisûr e.

⁸ Aras bi şaşî gotiye Milazgir, lê divê Elaşgir bûya.

Encam

Mem û Zîn an jî bi awayê ku Kazoyê Garisya dibêje “Memo [û] Zînê”, xwediyê cihekî taybet e di nav edebiyata kurdî ya devkî de û ji ber vê yekê hemû nû-varyantên wê hêjayî vekolînan in. Di nav hemû destanên kurdî de, Mem û Zîn yek ji wan destanan e ku bûye xwedî zaf varyantên pir-şêwezari di nav erdnigariyê berfireh a kurdî de. Memo û Zînê ya ku bûye babeta vê xebatê jî nû-varyanteke vê destanê ye ku heta nika nehatibû (ber)nivîsandin û danasîn. Di vê xebatê de, bala me ji motîf, karakter û vegêrana destanê zêdetir li ser pêvajoya bernivîsandina performansê destanê û di çarçoveya pêwenda çandî û civakî de têkilî, danûstandin û reaksiyonên guhdaran bû. Ev xalên bingeşên ên ku aidî performansê dengbêjan ya tabîî ne, di gelek xebatên bernivîsandina arşîvên dijîtal û kasetan de nayên nivîsandin û dîtin. Ev yek hin taybetmendiyên çand û hunera kurdî ya devkî ji derdora wê ya watedar dûtir dixê. Divê kaset di çarçoveya bernivîsandinê de wekî berhemeke sergîhayî were qebûlkirin û miameleyêke baldar pê re bê kirin. Dema ku wisa nebe, hêlên giring ên performansê dengbêj û tevkeriyên guhdaran ku rehendên giring ên vê çandê nayên bihistin. Ev çend salên dawî, gelek xebatên li ser arşîvên kurdî yê bideng tî çêkirin, mixabin piraniya van xebatan kilam û destanên dengbêjan ji pêwenda wan a çandî û civakî îzole dikin (bo nimûne bnr. Güneş & Şahin, 2019a, 2019b, 2021, 2022; Hemkoçer, 2012; Timar, 2021a, 2021b) û bi ser de jî hewldanên avakirina metnên kamil û îdeal form û teşeyê tabîî yê performansê dengbêjan xerab dike. Lewma ev xebat pêşniyaz dike ku di pêvajoya bernivîsandina destan û kilamên kurdî de destwerdanên zimanî yê cihêreng neyên kirin û materyalên dijîtal (di nimûneya me de, kaset) wekî berhemên serbixwe (ên hunerî) bêne nixandin. Bi vê mebestê, ev xebat balê dikişîne ser rê û rêkareke bi baldartir ji bo çareserkirina pêvajoyên tevlihev ên bernivîsandina performansê kurdî ku berî salan wekî kaset hatine tomarkirin.

Bi nixandineke pêwendî, di Memo û Zîna Dengbêj Kazoyê Garisya de hate dîtin ku dema wekî berhemeke temam û hunerî meriv nêzikî kasetê bibe û wê li gorî vê nêrînê binixîne, asta beşdarî û guhdariya cîmaetê, hêlên tîkildarî heqdestê dengbêj, hebûn û haydarbûna dengbêj ya ji varyantên din ên destanê, asta tîkildarî û nasyariya cîmaetê bi destanê re, serrastkirin an jî hewldanên midaxelekirinê yê guhdaran, lihevnekirinê li ser hin xalên destanê û hwd. derdikevin holê. Çawa ku Honko jî diyar dike, şiyanweriya tematîk a dengbêjê me di vê performansê de derdikeve meydanê, ew dema ku destanê dibêje midaxele û şaşiyên wî hene, hin cihan bi şaşî dubare dike. Lê piştî ku destanê diqedîne û dest bi kilamê dike heyecana cîmaetê dîsa zêde dibe û yek xwe nagire dibêje “razan tune kes ranazê”. Bi vî rengî eleqedarî û girêdana wî/wê ya bi hin cure û vegêranan re diyar dibe, stratejiyên performatîf û danûstendina dengbêj a bi cîmaeta hazir û guhdar re (*audience interaction*) û gelek faktorên din tesîrê dikin li ser performansê dengbêj ku ev xal di Memo û Zînê de jî tîne dîtin.

Beyan ve Açıklamalar / Daxuyanî û Ravekirin / Disclosure Statements

1. Yazar tarafından herhangi bir çıkar çatışması beyan edilmemiştir. / Ji aliyê nivîskar ve tu nakokiyên berjewendiyê nehatine destnîşankirin. / No potential conflict of interest was reported by the author.
2. Araştırmacıların katkı oranı beyanı / Beyana rêjeya tevkeriya lêkolîneran / Contribution rate statement of researchers: Birinci yazar / Nivîskarê Yekem / First author % 100
3. Bu araştırmada etik izin belgesi alınmamıştır. Çünkü araştırma belge ve dökümanlara dayalı yürütülmüştür. İnsan ve hayvanlar ile herhangi bir veri toplama sürecini içermemektedir. / Vê lêkolînê destûra belgeyê etîkê wernegirt. Ji ber ku ev lêkolîn xwe dispêre belge û dokumentan. Di vê xebatê de li ser meriv û heywanan tu zanyarî nehatine berhevkerin û nixandin. / This research did not obtain ethical approval because it was conducted based on documents and records. It did not involve any data collection process with humans or animals.
4. Bu çalışma döküman incelemesi yapan bir araştırma makalesi olarak tasarlanmıştır. / Ev xebat wekî gotareke lêkolînê hatiye amadekirin ku xwe dispêre nixandina dokumentan. / This study is designed as a research article based on a document review.

Çavkanî

- Ahmed A. (2007). Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê, *Kovara Bîr*, (7), rr. 228-244.
- Aras, A. (2018). *Şairê Kurda yê Efsanewî: Evdalê Zeynikê*. Stenbol: Nûbihar.
- Atlı, H. (2024). Destanên Kurdî ji Alîyê Taybetmendîyên Dirûvî ve. *Şarkiyat* (16) 1, 488-501.
- Attı, H. (2013). *Lêkolîneke Folklorî li ser Destana Mem û Zînê*. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi. Teza Çapnebûyî ya Masterê.
- Behary. (2022, April 15). قاسمى مەيرو، مەم و زین پارچانكى. Qasmê maîro mam u Zîn parça êkê1 [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=OXSkqI9ZOB>
- Ben Amos, D. (1971). Toward a Definition of Folklore in Context, *The Journal of American Folklore*, (84), 331, 3-15.
- Bender, M. (2019). Master Texts, and Monuments: Long Narrative Poems of Ethnic Minority Groups in China." *CHINOPEL: Journal of Chinese Oral and Performing Literature*, (38) 2, 65–90.
- Berbir, H. (2007). *Ji Dengbêj Fadilê Kufragî Destan û Çîrokên Kurdî*. Ankara: Enstîtuya Kurdî ya Amedê.
- Berekat Özmen. (2018, February 6). Aşık Selime Ciziri Mem u Zin Saliho berebin [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=1o3SOyQ2FbI>
- Berekat Özmen. (2023, May 15). Majid Hamkali-Hesene Güle Meme Alan Ev Dengbej Kiye berebin [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=itdkQW2ZLYY>
- Celîl, O., & Celîl, C. (2014). *Zargotina Kurda I: Êpik, Dastan*. Wien: Înstîtûta Kurdzanîyê.
- Chyet, M. (2020). Applying the Oral-Formulaic Theory to Mem û Zîn. *Kurdish Art and Identity: Verbal Art, Self-definition and Recent History*, (ed. Alireza Korangy) Berlin, Boston: De Gruyter, 1-39.
- Chyet, M. L. (1991). "And a Thornbush sprang up between them": *Studies on Mem û Zîn, a Kurdish Romance*. University of California: Unpublished PhD Dissertation.
- Cîhanî, P. (2022). *Mem û Zîn: Berawirdkirina Kurmancî û ya Hewramî*. Wan: Peywend.
- Çiftci, H., & Jahany, P. (2020). Beytên Kurdî: Memê Alan Wek Mînak. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 6 (11), 9-34.
- Delikaya, Ö. (2022, Gulan). "Dengê Min Nedin Teyîban": Hêmanên Dermetnî (Paratextuel) di Kasetên Dengbêjan de, III. *Uluslararası Dil, Düşünce ve Din Bilimleri Kongresi: Ekoller ve Kurumlar*. Mardin. Kurte: <https://www.artuklu.edu.tr/tr/mardinkongre/haberler/iii-uluslararasi-dil-dusunce-ve-din-bilimleri-kongresi-ozet-kitapcigi>
- Dilnar music دنلار ميوزيك. (2021, June 20). باقى خدو مم و زین Baqî Xido mem û zîn [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=K22UG0PMIqI>
- Ehmed, W. (1989). *Amêrekanî Mosîqay Kurdî*. Bexda: Weşanên Emîndaretî Giştîy Roşinbîrî û Lawan.
- Ekrem Kaya. (2018, March 18). Dengbej Kazo Garisya Ağrı Memo Zini [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=94H4aEKa6Ko>
- Faesal. Azez. (2019, September 14). ٢٠١٩ أيلول، ١٤ زین مەمو سەساوە حسن [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=iIU98NUEuOI>
- Foley, J. M. (2000). "The textualization of South Slavic oral epics" *Textualization of Oral Epics*, (ed. Lauri Honko) Berlin, New York: De Gruyter Mouton, 71-87.

- Folklore Kurdi. (2019, February 24). Mem and zin [Video]. YouTube.
<https://www.youtube.com/watch?v=9YRnj3eFNt0>
- Genette, G. (1997). *Paratexts: Thresholds of interpretation*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Gökalp, B. (2021). Zazaca Mem û Zin Halk Hikâyesinin Varyant İncelemesi. (ed. A. Kırkan & N. Beltekin.) *Zazakî û Zazayî Rêzexebatê Akademîkî (Edebîyat, Ziwannasiye, Folklor, Perwerde)*, 335-363.
- Güneş Müzik. (2020, February 4). Dengbej Reso, Memo Zin [Video]. Youtube.
<https://www.youtube.com/watch?v=Deejzgiuuds>
- Güneş, Ö. & Şahin, İ. (2019a). *Antolojiya Dengbêjan 1: Dengbêj Reso*. İstanbul: Nûbihar.
- Güneş, Ö. & Şahin, İ. (2019b) *Antolojiya Dengbêjan 2: Dengbêj Şakiro*. İstanbul: Nûbihar.
- Güneş, Ö. & Şahin, İ. (2021) *Antolojiya Dengbêjan 3: Dengbêj Huseyno*. İstanbul: Nûbihar.
- Güneş, Ö. & Şahin, İ. (2023) *Antolojiya Dengbêjan 3: Mehmûdê Hesê*. İstanbul: Nûbihar.
- Hassanpour, A. (1989). "Bayt," *Encyclopædia Iranica*, IV/1, p. 11-12.
- Hemkoçer, M. C. (2012). *Bêrîvana Cindî: Çend Destan û Serhatiyên devera Efrînê (Rojavayê Kurdistanê)*. Silêmanî: Enstituya Kelepûrê Kurdî.
- Honko, L. (2000). "Preface" *Textualization of Oral Epics*, (ed. Lauri Honko) Berlin, New York:De Gruyter Mouton, vii-viii.
- Honko, L. (2000). "Text as Process and Practice: The Textualization of Oral Epics" *Textualization of Oral Epics*, (ed. Lauri Honko) Berlin, New York:De Gruyter Mouton, 3-56.
- Jindires. (2012, May 6). Omer Cemlo Memê Alan, عمر جملو مم الان. [Video]. YouTube.
<https://www.youtube.com/watch?v=lIEAbeZMhd4>
- Jindires. (2017, February 26). Memê Alan Cemil Horo :مم آلان 5/5/1979 جمیل هورو [Video]. YouTube.
<https://www.youtube.com/watch?v=zOfRGy7Zp84>
- Jindires. (2017a, May 5). Memê Alan: Cemil Cemal Hobo مم الان بصوت الفنان جميل جمال حبو [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=vgx58FtxHYY>
- Jindires. (2017b, February 20). Eli Kapê:Memê alan ممی آلان بصوت الفنان علي كابه [Video]. YouTube.
<https://www.youtube.com/watch?v=DLiuSKtnJ84>
- Jindires. (2017c, May 24). Memê Alan,,Hesen Nazî,,م آلان مم نوزدي حسن بصوت: [Video]. YouTube.
https://www.youtube.com/watch?v=7PR5aV42_JM
- Jindires. (2018, November 3). Memê Alan: Mecid Hemgulîn,Tilifê مم الان مجيد حمكوللي تلفه [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=zELd6JHHX7Y>
- Jindires. (2022, April 17). Memê alan حنان عفده شعره [Video]. YouTube.
<https://www.youtube.com/watch?v=46aJtu7FpD8>
- Jindires. (2022a, March 12). Adîk efrîn memê Alan أدیک عفرین مم الن [Video]. YouTube.
<https://www.youtube.com/watch?v=voTOEm36dkQ>
- Jindires. (2023, November 29). Mistê Zênkê Destana Memê ala 1985 , مم آلان , مسته زینکه مم [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=wnHoLXyhgZ4>
- Kaniya dengbeja. (2020, September 30). Dengbêj Şemsedin(destana Memo Zin) Arşiv Cemal kılıc [Video]. YouTube. https://www.youtube.com/watch?v=H-8DUKd_47c
- Kaniya dengbeja. (2022, January 18). Dengbêj Kazoyê garisya, dengbêj Dursun (destana Memo û Zînê dûet) (jî arşîva kekê İrfan Kaya) [Video]. YouTube.
<https://www.youtube.com/watch?v=RQ1PDjRkNs8>

- Kaniya dengbeja. (2024, March 24). Dengbêj Mistefay'ê cangoranê- Destana Memo û Zînê [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=Jm1oCJR0RDc>
- Kaplan, Y. (2019a). *Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn*. İstanbul: Nûbihar.
- Kaplan, Y. (2019b). *Beyt û Destanên Kurdî*, İstanbul: Nûbihar.
- Kaplan, Y. (2022a). Di Navbera Çanda Nivîskî û Devkî da Beyta Feqîyê Teyran. *Nûbihar Akademi*, 5 (18), 11-45.
- Kaplan, Y. (2022b). Helsingandinek li ser Cureyên Vegêranê yên di Folklorê Kurdî da (Destan, Beyt û Vegêranên Strankî). *International Journal of Kurdish Studies*, 8 (2), 273-292.
- Kazım Atlı. (2019, June 16). Dengbej Zahîro, Destana Mem û Zîn, Full Albüm [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=0USw2UJZocQ>
- Lachenauer, I. (2022). *Artûhî Wept: New Approaches to Reading Emotions in Dānişmendnāme (The Book of King Dānişmend)*. The University Of Chicago: Unpublished PhD Dissertation.
- Lescot, R. (2013). *Memê Alan*. Avesta: Stenbol.
- O'Donoghue H. (2005). *Skaldic Verse and the Poetics of Saga Narrative*. Oxford: Oxford University Press.
- Ölmez, C. & Vali, S. (2020). *Mem û Zîna Hewramî*. İstanbul: Avesta.
- Öz, S. (2003). *Doğu ve Güneydoğu Anadolu Sözlü Kültüründe Hikaye Anlatıcılığı*. Mimar Sinan Güzel Sanatlar Üniversitesi: Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi.
- Perde. (2022, February 28). Sazvan Adîk- Mem û Zîn [Video]. YouTube. https://www.youtube.com/watch?v=-4_22EOxAcM
- Qanatê, K. (1996). *Mem û Zîn Duwanzde Varyant*, Stockholm: Roja Nû.
- Ready, J. L. (2015). The Textualization of Homeric Epic by Means of Dictation. *Transactions of the American Philosophical Association*. 145: 1-75.
- Reichl, K. (1997). The mixture of Verse and Prose in turkic oral epic Poetry. in *Prosimetrum: Crosscultural Perspectives on Narrative in Prose and Verse*, (eds. Joseph Harris and Karl Reichl) Cambridge: D.S. Brewer, 321-48.
- Reichl, K. (2022). *The Oral Epic: From Performance to Interpretation*. London, New York: Routledge.
- Sträuli, B. (2017). *Dewrêşê Evdî- Dewresh, Son of Evdî: A Kurmanji Epic as Performed by the Berazî Singer Baqî Xido*. Wiesbaden: Harrassowitz Verlag.
- Stüdyo Nergîz. (2019, September 18). Mem û Zîn (مەم و زین) الفەنان محمد و لید. *mem û zîn* [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=JdbSQdVOeHw>
- Subaşı, K. (2023). Fesad û Bêbext di Trajediya Evîne da: Weku Nimûne Destanên Evîna Mêjûyî. *Mukaddime, Özel Sayı - Klasikten Moderne Aşk Mefhumu*, 148-176.
- Subaşı, K. (2024). Ji Mîtolojîyê ber bi Tarîxê û ji Lehengîyê ber bi Evîne Destan Weku Çemkeke Siwan di Vegêrana Gelî da. *Şarkiyat* (16) 1, 104-116.
- Şêrzad Efrînî. (2011, October 3). Mem û Zîn. Bavê Selah û Xunav. 2011 . ملحمه مەم و زین . بافەي صلاح [Video]. YouTube. <https://www.youtube.com/watch?v=zkdVYZZUpYo>
- Timar, F. (2021a). *Destanên Kurdî I*. Ar: Ankara.
- Timar, F. (2021b). *Destanên Kurdî II*. Ar: Ankara.

PÊVEK: “Memo [û] Zînê” ya Dengbêj Kazoyê Garisya û Dengbêj Dursin

**[guhdarê ku teyîbê vedike] : de kerem ke
[Dengbêj Dursin dest pê dike]**

*erê dibê dilê mi yane li yane
dibê [...] bajarê hanê bajarê Muxribiyane
bajarekî pir mezin e [û] pir qîmet û pir girane
li ser sêsîd û şêst û şeş koşane
her koşekî yek lambê zêr û zîv pê da dardane
kevirê wî tamam aqrût [û] zimrût in bi zêr zîv kildane*

[Kazoyê Garisya]: Dursin jî xweş dibêje.

*dibê kevirê wî tamam aqrût [û] zimrût in bi zêr zîv kildane
li ser milê me hersê birane
me her sê bira ne ewlad e ne tewlade
emrê birayê me yê mezin bûye nod û nehane
navê birayê mezin Evdilrehmane
birayê ortê⁹ emrê wî bûye heştê û pêncane
navê birayê me yê ortênave wî Silêmane
birayê me yê biçûk Mîr Alan emrê wî ketiye şeşt û pêncane
em ê pir dewletî ne malê me pir girane
malê me nayê tu hesaba qelemane [û] defterane
barê kokî devê heranê¹⁰ kilît û anaxtarê devê xiznan û defînane
erê dibê me her sê bira ne ewlad e û ne tewlade
em ê sibe bimirin, malê me yê [bi]be xurê şeytane*

[guhdarkê]: zêde dirêj nekin, dirêj nekin

*herê dibê eyd hatibû eyda heciyane
xal çûne malê xarziya ap çûne malê biraziyane
bitûn eqrebe dost û pismam li hevdu geriyane
her sê bira rabûn meşiyane xasbaxçekî gulane*

**[Kazoyê Garisya] : Derbas ke. Keçikê jî bîne, paşê [bisekine]
[Dengbêj Dursin] : Keçikê bînim êdî tamam e
[Kazoyê Garisya] : De tu hela bêje hetanî wira, tu diha xaş dibêjî
[guhdarkê bi gazin] : Xeberdan zêde nabe¹¹**

ay ay sibe ye dilê mi demane

[guhdarkê]: were vira, heyran were vira, were cem me¹²

⁹ Orta: Navîn. Peyv bi tirkî ye.

¹⁰ Me ev peyv fêm nekir. Diqewime ku deve Heranê be.

¹¹ Guhdarek, ihtimal Mihemed Nurî dibêje, xeberdan zêde nabe. Ji ber ku dengê wan dîkeve teyîban û dû ra di nav xelkê de belav dibe, ji ber vê rewşê bi gazinc e.

¹² Hin guhdar ji derve tên an jî cihê xwe diguherînin, yek ji wan dibêje were li ba min rûne.

dibê ca sêr bikin şehre Mixurya şehrekî girane
 şehre Mixurya sêsed goze ne her gozekî şesid xane
 sêr bike nivîsîne (?) li ser dîrega ba berdane
 ezê bala xu didmê di ber ra xuşînê gemiyane
 li ber camekana şingîni pêsedrê zêrane
 ev her sê bira xu berdane baxê gul û sêvane¹³
 ji hevra gotine [û] giriyane
 kalekî nûranî peyda bû l'başiyane¹⁴
 go gelî zilaman hûn çima derin duşurmîş¹⁵ dibin evê roja eyda heciyane
 go navê wî Evdirrehman e go de tu Xizirî tu [û] Xudayê te va 'eyane
 em hersê bira ne em her sê bira jî bêurt in warreş in warindane¹⁶
 em ê dîmirin malê me zef e girane wê be xurê şeytan e

**[Kazoyê Garisya]: Dursin were
 [Dursin li vir dest pê dîke dîsa]**

herê dibê rabe yavrûm¹⁷ vekin derê xiznan û defînane
 bela[v] bikin li feqîr û fiqarane
 xurca tijî zêr bikin biherin bidne terkiyê menegiyane
 siyar bin berê xu bidne çiyayê Tûdî Sînane¹⁸
 evê sêva hanê bidne mihîna Bilêcane¹⁹
 dibê herine çiyayê Tûdî Sîna qonaxekî li ser behrane
 dibê²⁰ koşkek li kêleka adê²¹ dibê li ser behrane
 li derê wê koşkê bibin mêvane
 qîza Şêx Ehmed bixwazin Perîşan [...] ²²berbizêrane
 bînin j'birayê xu Mîr Alan ra-ne
 Xudê wê kurekî bide Mîrê Alan navê wî daynin Memê, Memê Mîr Alane
 Xudê wê cenûkî bide Bilêcane
 navê cenûyê wî²³ daynin Borane

[Dursin disekine û Kazoyê Garisya dibêje]

de loy (8x) loloyloy dilê mi li yane
 dibê li şehre Mixurya sê heb bira hene kasibê malê dinya ne
 ew her sê bira torçî ne eva li devê behrane
 torê xu avêtin ji bona masiyane
 torê wan kete kurikî jê di behrane
 kurîbehra girtin avêtine meydana şehre Mixûriyane

¹³ Di qeydên li ser înternetê de destan ji vir û pê de dest pê dîke (bnr. Ekrem Kaya, 2018; Kaniya dengbeja, 2022).

¹⁴ Baş: Serî. Peyv bi tirkî ye.

¹⁵ Derin duşurmîş dibin ji peyva “derin düşünmek” an ji “derin düşüncelere dalmak” tê bikaranîn ku meriv bi kurmancî jê re dikare bibêje “mitale kirin”, “ponijîn” an jî “fikirîna kûr”.

¹⁶ Warinda ango “war-winda” ew kesê ku pey wî nesla wî tune ku war û warîdata xwe jê re mîras bihêle.

¹⁷ Yavrûm: Bexê min. Peyv bi tirkî ye.

¹⁸ Dengbêj navê Çiyayê Sînayê ku di Quranê de wekî Tûrî Sîna derbas dibe wekî Tûdî Sîna bi lêv dîke. Me dest neda gotina Dengbêj Dursin.

¹⁹ Di vê varyantê de, navê mihîna ku cenûya Mem tîne, Bilêcan e. Navê hespê Memo jî Boran e. Lê navê hespê wî tenê carekê derbas dibe. Ji ber ku ji behrê derdikeve, li cihên din ji bo hespê Mem peyva “kurîbehra” tê gotin.

²⁰ Li vir dengbêj bi şaşî derbasî rîsteya bê dibe, lê dû re rast dîke. Halê ku meriv deste xwe lê wernede wiha ye: “dibê li derê koşkek li kêleka adê dibê li ser behrane”.

²¹ Ada: Girav. Peyv bi tirkî ye.

²² Li vir peyvek nayê fêmkirin, diqewime ku “beran” be, “beran berbizêrane”.

²³ Ferqeke berçav di navbera wî/wê de xuya nake. Li gorî telafûzê me nivîsî.

yek nikare bide bihayê kurîbehrane

*ji wan torçiya birayê mezin go apê Memoyê Alan Mîr Taştane
îsal çend sale Memo hatiye dinyayê jê ra nestandiyê hedyakî girane
emê kurîbehra berdîn derê Mîr Taştane
bira bistîne j'bona Memoyê Alane*

*wexta apê Memoyê Alane
kurîbehra lingê wê davê giraniya zêrane
ji bona Memoyê biraziyê xu lawê Mîr Alane
emrê Memo dertê heft û heştane neh û dehane
xu avêtne hicran û medresan û camiyane
dibê koşkekî Memo ra çêkirine
apê wî yê din navê wî Evdilrehmane li kêlekê behrane
ew binaya Memoyê Alan ne tê kirin ne tê firotane*

*dibê sê heb kevot hene xayîng in perî ne ketine dilqê kevotane
rokî xu berdane baxê gul û sêvane
li wana tê dengê wîtinê teyrane
sekinî li ser darê çinar û darê sêvane
navê kevota xayînga tewre biçûk navê wê Rihane
vegeriya li her du xayîngên xu kire gazî go
Xudayê kana keremê Rebbê ezzetê ji me ra kiriye keremeke pir girane*

*xayînga mezin navê wê Esmaxane go de lê (8x) baciye dilê mi li yane
ca'j mi ra bêjin Xudayê kana keremê bi me ra kiriye
kerem ew kerema Xuda bi me ra kiriye ew kîjane*

*Rihanê go baciye dilê mi li yane
ew kerema Mîrê Mîra bi me ra kiriye sê payê husnê dinyayê daya me hersê xayînga
pakî paşê daye mexlûqetan [û] benî însane
şewq [û] şemalê me daye avê hewzan û quleteynane
min dî[t] ya mezin bang kir go lê lê lê Rihanê baciye
ca dilê mi li yane sed carî li yane
Xudayê kana keremê li me ra kiriye evê kerema hane
bedewbûna dinyayê sê pay daye Zîna Zêdan [û] Memoyê Alane
paşê pakî daye me her sê xayîngane lê wîî*

[guhdark]: Can Kazim²⁴

*lê xayînga biçûk navê wê Rihane
gava vê xeberê hilda ji baciya xu ya mezin go ketine avê her du quleteynane
Rihan derkete ji hewz û quleteyna l'xakiribû kirasê xu yê kevotane
kirasê her xayînga xu tov kir û daye binê baskane*

*[Rihan] rabû li ser çilqê darane go baciye dilê mi li yane sed carî li yane
welle heta hûn nîşanî mi nedin bedewbûna Memê Alan û Zîna Zêdane
ez tu car [...] ²⁵ kevotane kiras xu qetandin xu berdane Mixuriyane*

²⁴ Cimaet ji dengbêj re dibêje Kazim, di kaseteke xwe ya din de jî dengbêj xwe wiha dide nasîn: “Navê min Kazim, ez xelkê Elaşgirê me.”

²⁵ Ji ber deng peyveke vir baş nayê fêmkirin. Lê dibe ku “nadim” be. Herwiha ihtimal heye di vir de qutbûneke biçûk a deng jî hebe.

*sekinî li camekanê pencereya Memoyê Alane
Memo serê xu derxistiye li camekane
her sê xayînga sêyr dikir bedewbûna Memoyê Alane
Rihanê bedewbûna Memo dixeriqî ji çilqê daran ra hate erdane*

*erê baciye her xayîngê peya bûne ser serê Rihanê werkirin baqê misk û emberane
Rihanê rakirine piyane
go baciye min nego tê bibî maşûqê Memoyê Alane
tu me ra tu carî diha²⁶ nabî mêvan berê xu nadî malî bavane*

**[Kazoyê Garisya]: Dursin were evî bêje
[Dengbêj Dursin]: Welle e[z] ewî naqedînim²⁷**

[Kazoyê Gariya dewam dike]

*erê lê lê baciye Rihanê go dilê mi yane sed carî li yane
go baciye welleh nava maşûqê Memoyê Alane
ca nişanî min bidin bedewbûna Zîna Zêdane
wan her sê xayîngan berê xu dan Cizîra Botane
dibê xanûmanê Zînê û Memoyê Alane benzemîşê²⁸ hevdu bûne eynî girêdane
sekinîye li ber camekane sêyr dikin bedewbûna Zîna Zêdane*

*Rihanê go lê lê baciye de were em sijde bibin Rebê 'alemê Mîrê Mîrane
em ê dia bikin Xudê biqedîne mirazê Zîna Zêdan [û] Memoyê Alane wîî*

*mi dî[t] Esmaxanê go baciye dilê mi li yane
te teze agir berda dil cîgerê herdane²⁹
vana sijde bir Rebê 'alemê Mîrê Mîrane
her sê xayînga dia kirin Rebê asîmane
anîn tabûta paşayê periyane
dane ser milê 'efrûtane
Zînê kirine şeklê miriyane
avêtine tabûta paşayê periyane
şevê nivê şevê li Memoyê Alan kirne mêvane wîî*

[guhdark]: Sihet xweş

ax dilê mi yane li yane wîî

Wexta [Zînê] anîn Memo razayî bûye, Rihanê datînine kêleka Memoyê Alan.

**[guhdark bi dengê nizm midaxele dike] : Zînê.
[Kazoyê Garisya] : Me yanîş³⁰ kir welle.
[guhdark] : Tişte nabe.**

²⁶ Daha: Êdî, ji vê şûn de. Peyveke bi tirkî ya berbelav e li Serhedê.

²⁷ Naqedînim, bi maneya nikarim. Dursin li vir dixwaze bibêje ku ez nikarim bendên pêş ê Memo û Zînê bibêjim. Ji vir şûn de tenê Dengbêj Kazoyê Garisya dibêje.

²⁸ Benzemek: Şibîn. Peyv bi tirkî ye.

²⁹ Herdu.

³⁰ Yanîş: Xeletî, şaşî. Peyv bi tirkî ye.

Zînê datînine kêleka Memo. Bala xu dayê Memo hişyar nabe. Rihanê hêdîka xu berda nava dîwana Memoyê Alan. Memo hejand hişyar kir. Memo çavê xu vekir bala xu dayê bacîkî kêleka Memo razaye. Memo go rabe tu kê yî? Ewî jê ra go tu kê yî? Ewî go tu hatî, ewî go tu hatî. Go xanûmanê herda, yanê ça ku dibêjin go benzemîşê hev dibû. Çêkirina wan eynî bû. Go *êyleyse*³¹, Memo go ku ez hatime, go navê cariya te çî ye, go gazî ke. Go cariya te hat. Memo ji Zînê ra go madem ku ez hatime. Belkî ez şaş bûme. Gazî cariya xu ke. Ku cariya te hat bizanbe ez hatime. Ku cariya te nehat ez ê gazî erebê xu kim. Erebat, bizan tu hatî. Go bira be. Rihan cariya Zînê ye. Zînê yê niha gaziyê cariya xu ke.

[guhhdarek]:e, e, belê

*lê Zînê go lê lê lêlê lê baciye dilê mi li yane li yane
erê Rihanê baciye dilê mi li yane li yane
belkî kor be nobetçiyê ber bîna Zîna Zêdan ji her du çavane
topal be ji her du lingane seqet be ji her du destane
ketiye xewê j'isûla nobetçiyê nizane
lawekî bava şaş kiriye rêya malê bavane
hatiye li baciya te bûye mêvane
erê Rihanê baciye were bide pêşiya vî lawî bavane
derbas ke cotê 'efrûtane
derbas ke ji soqaqan û ji mehlane
têxe serê rê û dirbane
bira³² here malê bavane
sibê di nava Cizîra Bota de bibe 'eyane
qîmeta Zîna Zêdan tê pênc qirûş û deh perane
erê felek xayîne xu ji orta Memo û Zîna Zêdan bide yane³³*

Bala xu dayê, Zînê gazî kir cariya wî nehat. Memo go baciye go, te gazî kir cariya te nehat. Îcar ez gazî erebê xu kim ku hat bizanibe tu hatî. [Zînê] go belê.

*Memo go lo lo lilo lo lo lolo lo erebşapûno dilê mi li yane
belkî kor be nobetçiyê li ber Memoyê Alan³⁴ ji her du çavane
ketiye xewê bacîkî şaş kiriye rêya malê bavane
hatiye l'birayê te bûye mêvane
erebşapûno bide pêşiya vê hermetê derbas ke ji cotê 'efrûtane
ji piling û ji şêrane ji tebarê dilqê masîyane
tinebûna dinyayê pir zor û pir zehmet e bavêje pêşiya vê hermetê çenge zêrê hane
evê hermetê derbas ke ji soqaqê Mixûryane ji mehlane
têxe ser rêya cedê bira here malê bavane
şaş kiriye riya malê bavan li birayê te bûye mêvane
sibê di nava Mixurya da wê bibe eyane
qîmeta Memo tê pênc qirûş û deh perane
felek xayîne xu ji orta Memo û Zîna Zêdan bide yane*

Memo bi vê xeberê ku bala xu dayê erebşapûnê wî ku deng hat go Memo emir ke. Go tu here. Go baciye tu hatî. Te gazî cariya xu kir nehat. Binêr erebê min hat. Tu hatî. Memo go nişanekî min dîsa heye. Go hespekî min heye nişanî te dim. Go herge yê isa di nav êla bavê te da hebû tu bizanibe ez hatime. Wexta ku peyayê jêrê bûn, bala xu dayê ku hespê xu nişan dayê. Zînê go nexêr hespê ha êla bavê min da tune.

³¹ Öyleyse: Madem wisa. Peyv bi tirkî ye.

³² Li Serhedê, peyva "bila" forma "bira" werdigire.

³³ Yan: Kêlekê. Peyv bi tirkî ye.

³⁴ Li vir xwe şaş dike berî dibêje Zîn, dû re rast dike.

Zînê go êleyse, min qey gotiye xorta eşq lê xistiye. Dême³⁵ min lê xistiye. Xudê j' mi ra xerab anîye. Memo xulamê xu da pêşiya Zînê, go derbas kin bira here. Wexta Zînê derbas kirin ji nava şehre Mixurya.

[guhdark bi dengê nizm] : Gustîl dixwaze?
[guhdarkî din] : Bise hê maye wexta wê.

Zînê vegeyriya ji xulamê Memo ra go êvare, ro çû ava. Derê xana, derê dikana, derê qawa³⁶ gi li min hatiye dadanê. Ka ez jin, esyete³⁷ berê xu bidim ku da herim. Ji axê xu ra bêjim îşev bi mêvantî mi [bi]hebîne.

[guhdark ji ber heman risteyê dibêje]: bi xuştî min xayî ke.

Bi xuştî û biratî mi bihebîne. Min qey gotiye xortan eşq lê xistiye. Dême min lê xistiye. Xudê min ra xerab anîye. Xulamê Memo hat ji Memo ra go. Memo go bira be. Hatin dîwana Memo bû mêvan. Go dersê herda yek bûn. Kitêbên ku xwendine, go herda kitêban jor da anîn. Ewî û Memo ser kitêbê da mitale kirin, xwandin. Memo hey binê çavan ra lê dinêre. Memo go bira ji te ra we'd be, zewaca min hebe, pêştirî nefsa vê tu kesî naxwazim.³⁸ Hey lê dinêre. Evana di hevra mitale dibin. Her du hevra cî bi cî radizên.

[guhdark]: im hi.

*dibê ew her sê kevot sekinîne ber camekane
 Memo û Zîna Zêdan ketine xewê razane
 dia kirne ji Rebê 'alemê Mîrê Mîrane
 anîne tabûta paşayê periyane
 Zîna Zêdan kirne şekilê miriyane
 Rihanê jor da xu berda camekana Memoyê Alane
 derxistiye gustîla Zîna Zêdan [û] Memoyê Alane
 gustîlê wan bi hev guhirî her du razane*

[guhdark li ser pevguherîna gustînen Mem û Zînê]: Gustîl teze guherî da³⁹

*anîn Zînê kirne şekilê miriyane
 avêtine tabûta paşayê periyane
 dane ser milê cote 'efrûtane
 berê Zînê dane şehre Cizîra Botane*

[Guhdark] : Welleh eva jî hediya girane xalo.
[Guhdarkî din] : Lê lê.
[Kazoyê Garisya] : Ji bona xatirê Miheme Nurî, em niha hatine mala wî. Him xinamiyê me ye, him jî ximantî me diha teze kiriye. Xudê silametiye bidê. Me jê ra sê band tijî kiriye. De êdî dide nade, kêfa wî ye.
[Mihemed Nurî] : Xudê ji te razî be, Xudê şerefa te zêde ke însalla.

*dibê wexta Zînê birine vê sivingê Cizîra Botane
 danîne dîwana Zîna Zêdane*

³⁵ Dême: Nexwe. Peyv ji "demek" a tirkî an jî "demek ki" yê ketiye nav kurdî.

³⁶ Qawa: Qehwexane.

³⁷ Peyveke herêmi ye ku ji bo keçikên xama û jinan tê gotin.

³⁸ Guhdark bi tevî Kazo dibêje "tu kesî naxwazim".

³⁹ Ji ber ku li jor yek midaxele dike ji bo sehneya gustîlê, ev guhdark îtiraz dike û dibêje bisekine. Ji ber ku li vir ev sehne tê, bi dengê ku xebera wî rast derketibe vê risteyê dibêje: "Gustîl teze guherî da".

*Zîne sibê rabû li ometa Miheme Mistefane
çavê xu vekir ewa xewn û xiyal bû go min dîtiye di xewê da-ne
Zîne gustîlê mêze dike hiş û sewda li serê Zîna Zêdan nemane*

*ca em bêne dora Memoyê Alane
hiş û sewda li serê Memo namena
cab didane Alane
go de derdekî peyda bû li Memoyê Alan derdê bê dermane*

Alan go, kurê min nexwaşîya te da we çi jê ra anî hat. Nexwaş nebû. Ev çi derdekî bê derman bû? Ewladekî mi bû, me çavê xu bi rehma Xudê û wî vekiribû. Nexwaşî nedî va çira jê ra peyda bû. Evîya kurê min benga wî ya zewacê ye. Ez jê ra qîzê paşa û axalera, hetba wî tine bira bêje ez bizewicînim. Kê qîza xu nade kurê min. Ez kasidek im? Ez feqîrek im?

[guhdairek]: na.

Wexta zewacê ezê... Memo. Gotin Memo tîra eşqê lê xistiye. Bavê Memo go êsleyse go nigê hespê Memo li qeydê xin. Dora sûrê jî gazî feqîr û fiqara bikin, şehre Mixurya dora wê sûr kin. Derga lêxin. Derî ji Memo ra venekin. Memo gustîlê dinhêre dixerike. Memo gazî navmaliyê xu kir, erebê xu kir. Go tivdarekê hespa min bikin, ez ê herim. Go ez ê herim. Teng [û] berê hespê min bişidînin. Ez ê herim xatirê xu ji kalê bavê xu bixwazim. Memo çû cem bavê xu wê xatirê xu bixwaze.

*dibê Memo go bavê kal dilê mi li yane
Memo hatiye xatirê xu bixwaze ji bavê kal, bikeve li serê rê û dirbane
Alan go Memo lawo me li jorê çavê xu vekiriye rehma Rebê 'alemê li jêrê ewladekî lawane
were me kal û pîrê vî zemanî nehêle l'ber dîwarane
ez ê li te ra bînim qîzê axan û paşan û begane
qîzê seyîdan û ulemanê*

*Memo go bavê kal, ez naxwazim qîzê axan û paşan û begane
ez naxwazim qîzê seyîdan û şêxane û melane
ewa mi dîtiye di xewnê şevane*

*bavê Memo go Memo lawo were neke bi gura xewnê şevane
de rabe lawo gi xiyale qelbê xu bavêje nekeve li ser rê û dirbane
me nehêle li ber dîwarane
şehre Mixurya lawo bin emrê me her sê mêrane*

Çiqas go, serê Memo da rûneniş. Memo go de îja ez herim xatirê xu ji diya xu jî bixwazim.

*Memo go dayîkê dilê mi li yane sed carî li yane
ez hatime tê min helal kî şîrê berê jê di bistane
ez ê bikevim serê rê û dirbane*

*dayka Memo go lo lo lo Memo dilê mi li yane sed carî li yane
lawo were nekeve serê rê û dirbane
me kal û pîrê vî zemanî hanê nehêle ber dîwarane
neke bi gura xewnê şevane
me çavê xu li jorê vekiriye rehma Rebbê 'alemê Mîrê Mîrane jêrê ewladekî lawane
were nekeve serê rê û dirbane*

*Memo go dayê ewa ku min dîye xewnê şevane
îznê bide berxê xu ez ê bikevime serê rê û dirbane*

dayka Memo go Memo lo lawê xazî bi min xazî
 lawo bes e nayê kişandinê gotinê te û lome li vî nazî
 tu ber çavê her du apê xu kalê bavê xu mîna zêrekî reşadî lawo zêrekî qazî
 lawo te goştê cegera mi helandiye ji hestiye pîra çend salê hanê li dinyayê lawo çi dixwazî
 were me kal û pîrên vî zemanî halê nehêle ber dîwara berxo belengazî
 lawo herge tu nasekîni ez ê dia bikim Rebbê 'alemê Memo tu şa nebî bi tu mirazî

[guhdark]: heywax heywax

Mamo bala xu dayê. Diya wî vê xeberê got. Nihêrî Memo nasene. Memo vejeriya, gazî xulamê xu kir. Go hespa min bikişîne, hespa wî kişand. Çû ber sûrê derî xist. Dergevan got ew kî ye. Go ez Memo me derî veke. Ê Go Memo tu lawê Alan î. Go bavê te sûrê dora şehir gerandiye derge lêxistiye. Go ez jî feqîr im, hijde nifûsê min hene, emrê min jî gêçgîn⁴⁰ e. Bona îdara dinyayê, welle ez derî li te vekim, bavê te yê serê min jê ke. Go ê niha bavê min serê te jêke, go erê. Êyleyse go derî veneke. Memo, lingê hespê wî li qeydê ye. Hespê xu qederekî meşand. Qamçî avête te hespê wî ser sûrê ra banzda ajot. Memo kete rê û dirbê. Li pey Memo qûrîne, qûrtîne zarîn, şîn û girîn e. Memo ha'j⁴¹ xu tune.

Qederekî ajot, bala xu dayê kalekî nûranî çev û birûyê wî ye reş. Ser rê hêdî hêdî diçe, Memo xu gihandê selam dayê. Selameleykim bavê kal, 'eleykimîselam. Memo derbas bû. Kalê gazî kir go xortê qenc go ez kal im extiyar im. Go germa welatê min em helandin germe go çima min qederekê bavê terkiya xwe. Memo go derdê min kula min derdê ez ketimê, ez vî kalî li ku bavê min terkiya xwe. Qederekî çû, yaw go ez lawê Alan im, go sibê kalê here ciya bêje, rastî min hat vî yaş⁴² han da. Vegeriya, banzda erdê go bavê kal were siwar bibe. Go ca lingên hespa xu mêze kir, lingê hespa xu mêze kir, hespê wî qeydê ye. Memo qeyda hespa xu şikenand, desmala xu kire du parça lingê hespê xu girêda. Go de îja li çiyayê qarşî xu binêre. Gava li çiyayê qarşî xu nihêrî, kalê [w]inda bû. Go heywax heywax, evê hanê çav û birûyê wî reş belek. Yeşîn ça dibên Xoce Xizir e. Go min niyeta xwe, soniya⁴³ emrê xwe, min Zîne çî karî bê jê siwal nekir. Wexta ku go binêre li çiyayê qarşî xwe, go hevza xu bike tê avek da herî. Memo kete rê.

hay Memê min ketê rê dirbane
 sêr bike vê sibengê Memo kete rê û dirbane dirbane hayayay dirbane
 bi şev û ro dajo kurîbehrane
 dibê xu nêzîkî muhîte Cizîra Botan kir
 go ev cotkariya hanê, yeşîn çotkariyê Cizîra Botane
 Memo xu berda devê Şetê Cizîra Botane
 Bekoyê Ewane reml daniye Memoyê were Cizîra Bota bibe mêvane

-Xuşka wî, hinek dibên qîza wî ye.- Beko ku reml datîne wê Memo bê. Hiriyê didê wî, dibê here devê avê bişo. Siyarekî a vê formê bê. Memoyê Alan e, bêje eva çil roye ez li vira hiriyê dişom, ez ser rêya te bekle⁴⁴ dikim. Memo derbas ke bêje bona te ez li rê bek[le dikim], ege[r] ku te birî bir, te nebir Memo derbas ke valî⁴⁵, rihê wî li Xudê ye, rihstandina wî li bavê te.

ayayay Memo gava xu berda nêzîkî şehre Cizîra jê di Botane
 li bala xu dayê pîrekekê li devê Şetê Cizîra Botane
 Memo kurîbehra avête Şetê Cizîra Botane

⁴⁰ Geçkin: Bihurî. Peyv bi tirkî ye.

⁴¹ Haj xwe tune: Hay ji xwe tune.

⁴² Yaş: Temen, emr. Peyv bi tirkî ye.

⁴³ Son: Dawî, talî. Peyveke bi tirkî ye.

⁴⁴ Beklemek: Sekinîn, rawestîn. Peyv ji tirkî tê.

⁴⁵ Valî: Li vî alî.

Pêlê avê lêxist Memo [û] hespê ser hev da wer kir. Kalê nûranî xu gihandê go min ji te ra nego Memo.

[guhdark jî bo Xoce Xizir]: Hey ez qurbana te bim.

Min te ra nego tê avekî da herî hewza xu bike. Go welle eva Xoceyî Xizir e. Bira mi derxe adê herda gava ku wî derxiste orta her du çiklê Cizîra Bota, go qarşî xu binêre, go nihêrî, kalê nûranî, heywax heywax. Go min dîsa lê siwal nekir. Go ez îja ça[wa] ji vê çilqê derbas bibim. Bala xu dayê jinek walî hiriyê dişo.

*Memo go baciyê dilê mi li yane li yane sed carî li yane
ev milletê mexluqetê welatê we çane
qe qedrê rewî, feqîr û xerîba nizane
baciyê de were nîşanî mi de, rêya vî têrmaşî gêçî⁴⁶ û delavê şetê we kijane*

Xuşka Bekoyê Ewanî go Memo go eva çil royê min e, e[z] rêya te bekle dikim. Gava ku Memo wî dît, orta her du şetan [da] maye. Memo go heywax min bavê xu, diya xu kal pîr, xizne û defîne hîşt bona vê.

[guhdark]: Ereba reş.⁴⁷

Eva bona vê, eva hanê... Memo kir [ku] vegere. Xaliqê 'alemê go ziman wî çaxî avête devê hespê wî. Go hespê wî go Memo eva tu dibêjî eva ne ew e. Eva reş e xuşka Bekoyê Ewane. Çariyara serê riyane. Rêwiya vedigerîne şûna.

Bala xu da jinikê, xuşka Beko nihêrî ku Xaliqa 'alemê ziman avêtiye devê hespê pê ra xeber da. Go welle êdî qîmeta min namîne. Go êyleyse tu Memo yî, tu soz didî min ti Zînê biherî ez jî cariya wî. Ti ku mi bi xu ra carî biherî, welle ez ê nîşanî te bidim delav. Ti nedî tu bib'ecî jî tê li wira bî. Go ez soz didime te ku ez Zînê ji xu ra biherim Mixuriya ti jî cariya wî. Temam. Hat go ege[r] ji jor ra ege[r] di jêr ra lêxist Memo derbas bû. Memo derbas bû. - Awakî de berê digotin Qeretajdîn⁴⁸ li nêçiriyê ye felan.- Dibê Memo dîzgînê hespê xu davê ser qaşa zîn. Dibê hespê wî ku bisene. Dibê hespê wî dikeve soqaqa digere nava Cizîra Bota, diçe derê Qeretajdîn.

Memo li derî dixê dibê jina Qeretajdîn xuşka Zînê navê wî Sitî bûye. Carîkî dişîne dinêre nehat, ya duda dişîne dinêre nehat, bixwe diçe, bixwe diçe dînhêre. Wê Memo peya be, pê ra xeber didin, pê ra xeber didin. Dibê Memo ku peya dibe, dibê îja jina Qeretajdîn Sitî merfekî dişîne dibêje Qeretajdîn dîwana mîr bira were mêvanê me hatiye. Yek diçe nayê, dudu diçe nayê jina wî bi xu diçe. Diçe dibê Qeretajdîn mi du qasida şand têra te nekir? Mêvanê me hatiye. Îja ez bi xu hatime. Mêvanê me hatiye. Ku evê xeberê dêje. Beko radibe dibê 'heyf 'heyf dibê. Yaxa⁴⁹ sakoyê xu digire xu digre dibê xêr bereket heya şerm mîrê min nema li vî memleketî me. Min nediye jin di dîwana birayê xu da here gazî mîrê xu [bi]ke. Sitî dibê;

*hayê Beko dilê mi li yane li yane
bes e di dîwana camêra da biterkîne vê fesadiya xu yî hane
mêvanê me mêvanekî wusa ne ku bê dîwana mîr begane*

[dengê kuxikê tê bihîstin]

tu û mîr beg û Qeretajdan hûnê bimînin li ser çogane

⁴⁶ Geçit: Bihur, bor, delav. Peyv bi tirkî ye.

⁴⁷ Guhdar vê gotinê jî bo xwişka Bekoyê Ewan dibêje.

⁴⁸ Dengbêj li vir dixwaze bibêje ku awayên (variant) din ên vê episodê hebûne din av dengbêjan de.

⁴⁹ Yaxa: Berstük. Peyv bi tirkî ye.

Carke dinê Beko sakoyê xu digire, dibê ez ê derêm. Dibê mîrê min bereket [û] ‘heya nema. Qeretajdîn radibe ew Sitîyê va diçin. Beko carke dinê teze dike⁵⁰, Cegan li wira bûye.

*Cegan dibê Beko ez heme, Cegan im Ceganê dînim⁵¹
ez dest bavê m qebza şûrê hêşînim
ez ê koka Cizîra Bota hemû biqelînim
ege[r] vê sibengê ecel bi destê me nîne
Beko min û te va gelek ji destê hev dîne
bes e dîwana maqûla vê fesadiya xu biterikîne*

Îja ku Cegan wiha dibê evana kerr dibin. Qeretajdîn diçe mêvanê xu peya dike. Dibê mîr dişîne pey dibê bira Qeretajdîn mêvanê xu bîne dîwanê. Qeretajdîn mêvanê xu tîne dîwanê, tê dîwana mîr, mîr dibê Qeretajdîn welle mêvanê te wê heft roya li cem mi bimîne. Heft heşt ro li cem mîr dimîne nahêle.

[guhdark] : Heyran na wê çaxî mîr [...]
[Dengbêj Kazo] : De hela bise, tu bê destmal radixin, ew ayrî⁵²

Dibê îja Sitî dibê Qeretajdîn eva mêvan hate derê me ne [...]⁵³. Ne nonekî me xwar, yaw here mêvanê me bîne îro heft e dîwana birayê min. Em siwalekî jê bikin ji ku da tê ji ku da. Elbet. Neyse⁵⁴ Qeretajdîn dibê diçe mevanê xu tîne. Dibê mîr dibê welleh îro şeş heft roye li cem min e, em ji hurmeta wî ji xeberdana wî têr nebûn. Dibê mîrê mi mêvanê min e ez biherim mala xu dîsa ez bînim.

Ewa ku dibine mala xwe, siwal dike ti çi kesekî, ku da⁵⁵. Dibê axayê mi dibê maşûqeke mi li vir e, ez bona maşûqa xu hatime. Ê dibê Qeretajdîn dibê hege[r] maşûqa te jina mi be, dibê diya lawekî ye. Sozê namûsê ti ji wira derê bê vira ez ê bidime te.

[guhdark]: Te xu derê mi girtiye hatiye.

E, dibê ez ê [Stiyê] bidime te. [Memo] dibê maşûqa mi ez zanim. Qeretajdîn dibê cab dike elhê Cizîra Bota ji qîza ji jina ji bûka çi he[ye] bira tamam bên ber dîwana mi ra derbas bin.

[guhdark]: Ehe.

Dibê ku derbas dibin. Memo ber pencerê ye sêva xu ji yekî jî naxe. Kê ma kê nema? Dibê ma Zînê û Rihan, cariya wî. Dibê ma Zînê û Rihan.

[Kazoyê Garisya]: Me ji. Ferdek dudu gere [bigota]. Ma, me nego.⁵⁶

Go dibê de îja ewê gotinê gotinçiya, dibê Sitî û Rihanê heft awazan Zînê xemiland go eva bû eva nebû, eva bû eva nebû. Go wexta di ber dîwana Qeretajdîn ra derbas kirin, Memo sêva xu avêt Zînê xist. Go ku lêxist go îja cab dane Cegan. Go dergistiya te ye. Go Memo sêva xu dergistiya te xistiye.

*Cegan go ez heme Cegan im Ceganê dînim
ez qehra Memo û Qeretajdîn nakişînim*

⁵⁰ Li vir dengbêj dixwaze bibêje, Beko gotinên xwe yên derbarê Sitîyê de dubare dike.

⁵¹ Guhdarek bi tevî dengbêj dibêje “dîn im”.

⁵² Ayrî: Cuda. Peyv bi tîrkî ye.

⁵³ Li vir çend peyv nayê fêmkirin.

⁵⁴ Neyse: Werhasil. Peyv bi tîrkî ye.

⁵⁵ Dengbêj bi xwe disekine. Ferda xwe naqedîne.

⁵⁶ Dengbêj li vir li xwe mikur tê ku di vê beşê de çend ferd ji bir kirine ku divê bigota.

*ez ku dest bavê qevza şûrê hêşînim
ez ê koka Cizîra Bota hemû biqelînim
ez ê di gora bavê Qeretajdan û mêvanê wî nim*

Cab didane Qeretajdan go Cegan hatiye heddetê. Qeretajdan çû go lawo go min soz dayê. Min nexwestiye jî. Me gustîla xu pê da nekiriye. Me sozek daye, mêrkek xu li merifa girtiye hatiye law. Welleh jina min bûya jî minê bidayê. Ê go madem te soz dayê tu birayê min î mezin î, welleh mi jî hubbeyê nefsa Memo kir. Wexta ku [...] ⁵⁷ dora zarê wî û mêvanê wî...

[...] ⁵⁸

*mi go Memo dibe hayê Cegan dilê mi dîne
kuro bes e van lafan neke dilê mi li yane
tu were [...] ⁵⁹ kemberê piştane
çika li meydanê kê berx e kê berane
bes e bike van lafane
kuro welatê xu der bûme ji bona kevnê ⁶⁰ li we bûme mêvane
qesem bikim navê Xweda tu li welatê me bî bavê min yê nota te naxe seyîsê ber hespane*

Wexta ku Memo evê xeberê dibêje, Qeretajdîn diçe cem Cegan dibê Cegan lawo me vê keçkê behs kiriye. Me nexwestiye, me sozek daye hevdu. Wexta ku eva ji Muxiriya hatiye li me bûye mêvan, wellehî maşûqê wî jina min bûya jî, diya dergûşekê ye, min ê bidayê. Mi soz dayê. Ê Cegan dibê, Qeretajdîn madem ku te soz dayê, [ti] birayê min î mezin î. Welleh ji îro şûn da bira Zînê hubbeyê canê Memo be, bi şert û helalî, mi jî helalî canê Memo kiriye madem te soz dayê.

Wexta ku eva mîr dişîne dû Memo. Dibê Memo dibê *arti* ⁶¹ diha tu bû memleketliyê me, ehlê vî memleketî. Dibê cem me heft ro carekî em diçine nêçîrê. Dibê tê jî me ra werî. Dibê bira be mîrê min. Wexta siyar dibin diçine nêçîrê. Ê ku nêçîr radikin hespa Memo nêçîr nade tu kesî. Ne hespa Qeretajdan ne mîr ne Beko, teva digire.

Rokî Memo, Zînê Memo xu davêje nexwaşiyê. Dibê Qeretajdîn dibê îro hûnê herin nêçîrê yalaniz ez hebe ⁶² rehesiz ⁶³ im. E[z] nayê. Mîr jî dişîne dû Memo, Qeretajdîn dibê mîrê mi Memo nexwaş e, hebe rehesiz e, ê bira be dibê.

Wexta siyar dibin diçine nêçîrê digerin, Bekoyê Ewan li serê çiyê remlê datîne. O mîrê min dibê tu hatî çî digerî. Dibê hatime nêçîrê. Ê dibê nêçîr dîwana te da di baxçê te da ye. Tu hatiyî serê çiyayan digerî. Dibê her ro di dîwana te da yê dibê bergîra min yê dibê hespê mi yê dibê kihêla mi, îro ji vê rindtir tune. Em ê isa bajon kê çû kê ma! Hespa kê çû bira ew salixê bide. Ya kê jî para ma bira diha behsa hespa xu neke.

[guhdark] : Erê welle.
[guhdarkî din nifiran li Beko dike] : Heylê Xudê derê te dade.

⁵⁷ Ji kuxikê li vir çend peyv baş nayê fêmkirin.

⁵⁸ Li vir kuxik zêde ye nahêle ku meriv ji çend bendan baş fêm bike.

⁵⁹ Li vir peyvek nayê fêmkirin. Lê dengbêj heman beşe li jêr bi şaşî tekrar dike.

⁶⁰ Ji bo Zînê dibêje “kevnê”. Di dewsa vê peyvê de li Berfiratê “êgsîk” tê bikaranîn ku temsîleke rajêr a jinê nişan dide.

⁶¹ Artîk: Êdî, ji vê şûnde. Peyv bi tirkî ye.

⁶² Hebek: Hinek, piçekî.

⁶³ Rehetsiz: Aciz, nexweş. Peyv bi tirkî ye.

Bavo evana ku diajon. Mîr dibê bira be. Dajon, tên derê...⁶⁴ - Yanî awakî dibên baxçe da bûye, awakî ku hin dibên dîwanê da bûye.- Wexta ku tên dibê, dorê peya dibin dorê dîwanê digirin dibê. Selamê didine Memo, dibê Memo selama mîr digire. Ema ranabe piya.

*Beko dibê mîrê mîn dilê mi dîn e sed carî dîne
ca sêyr bike mîr selam da Memo, Memo rûniştiye selama mîr bi qûn distîne
Memo go mîrê mi ya Beko dibê, dilê mi bi kulo ha bi birîne
gotina Beko usa nîne Memo vê sibengê ya li ber pişta mi rext û zîne*

*Beko dibê mîrê we ye bi min we ye
welleh tişte[k] di binê kurkê Memo da heyê
kê diye merfêkî rûnê li dîwanekî cotqundire ye*

Dibê Qeretajdîn ku dizane Zînê ye di binê kurkê Memo da. Qeretajdîn dibê xu gihande mala xu gazî Sitiyê kir go Sîtî go tê birevî biqarî nava Cizîrê da. Go ez xu li ku bigihinîme te ez ê te bikujim.

[guhdark]: himm

Sîtî wexta ku direve, Qeretajdîn dide şûr pey dikeve, cab didine mîr dibê Qeretajdîn hatiye hêrsê dibê wê Sitiyê bikuje. Beko dibê mîrê mi qerebalixa wî guh nedê. Yeqîn ava destmêja wî dereng aniyê, hêrsa Qeretajdîn hatiye, ew e başqe çi ye.

[guhdark]: tişte[k] jî tine

Dorê Memo birîne, dibê wellehî, dibê Memo rûniştiye. Dibê Qeretajdîn, mîr dibê Qeretajdîn agir berî xanûmanê xu da. Beko dibê mîrê mi na, zar in, qırşqala top kirine agir berdane ji xu ra vêdixin, Qeretajdîn çima agir berdê. Carke dinê qasid dibê heyra welle agir berê xanûmanê xu daye. Dibê, awayê ku dibêjin dibê zêr û zîvê wî diheliya di pencere ra dihat.

Dibê evana ku radibin, herin hewariya xanûmanê Qeretajdîn. Dibê Beko her du destê xu dide ber derî, dibê ku Memo radibe Zînê ji binê kurkê dertê. Memo ku here bona xanûmanê Qeretajdîn, Beko dibê mîr mi de vegere, de vegere binêre, de vegere binêre! Mîr dizivire, dinihêre ku bistanê xuşka wî xanê kir⁶⁵, mîr go *hemdolsin*⁶⁶ navê jina mi ji Zînê ye, jina min nîne xuşka min e.

Evana wexta diçin, Memo ji diçe dibê xanûmanê Qeretajdîn agirê wî ditemirînin, dibê Beko dibê mîrê mi Qeretajdîn xanûmanê xu şewitand. Em ê xeraca heft sala bidine Qeretajdîn bira here top [bi]ke bîne pê xanûmanê xu serast [bi]ke. Mîr gazî dikê. Dibê Qeretajdîn mêvanê te jî yê me jî⁶⁷. Mem bû ehlê memlekliyê me dibê te ewa zirar li te kir, xeraca heft sala here bajarê Roşka top ke ji xu ra bîne.

Dibê wexta Qeretajdîn diçe bajarê Roşka dibê mîr [û] Memo ji xu ra her ro sohbet dikin dibê kişik dileyzin. Dibê Memo heft dest kişik ji mîr dibe. Dibê Beko diçe dibê Zînê mala bavê te şewitîyê dibê. De were şertê dilxwastine were qarşî dîwana mîr bisekine. Memo ji birayê te biriye. *Hêç olmasê*⁶⁸ bira te bibîne te bixwaze. Dibê Zînê wexta tê pencerê walî dîwanê disekine ema pişta Memo pêda ye.

*Beko dibê mîrê mi kişik hene bi dor in
ca rabe tu û Memo cihê xu bi hevdu biguhorin*

⁶⁴ Dengbêj li vir ferda xwe naqedîne û bi xwe disekine.

⁶⁵ Xanê kirin: Xuya kirin. Eşkere bûn.

⁶⁶ Hamd olsun: Hemd be, şikur be.

⁶⁷ Bi maneya mêvanê te yê me ye jî.

⁶⁸ Hiç olmazsa: Qet nebe. Peyv bi tirkî.

Dibê mîr dibê welleh xebera wî ye Memo. Her[du] cihê xu bi hev diguhurin. Berê Memo dikeve ew bîna Zînê tê da li vir e. Memo dîsa dileyze. Beko dibê mala te xerabo serê te hema berjêr e, ser kişika da. Qet li dora xu nanihêrî. Memo ku aha Zînê dibîne. Êdî hema çavê wî li Zînê ye, peya dide siyara, siyara dide dest peya. Mîr heft desta jê dibe, heft jî helal dike. Dibê mîrê mi dibê, Beko dibê niha şert yê me ye. Mîr dibê na. Dibê şert yê Memo ye, berê ewî ji me biriye. Ê dibê xwastina ku Memo dixwaze layiqê gotina te nîne. Ka ça[wa] dibê? Memo îja wî çaxî;

dibê mîrê min sibe ye dilê mi dîne
Beko ça[wa] dibê wisa nîne
ya ku Beko dibê wisa nîne
ya Memo dibê sertacê bîst û yek horî nazenîne

Beko dibê mîrê mi behsa Zînê kir. Ewa dibe xeybet xalî. Yalaniz mîr dibê Memo em dilketiyên xu bêjin. Mîr dibê navê dilketiya mi Zîn e. Memo dibê navê dilketiya mi Eyšan e. Memo hatiye [...]⁶⁹ Muxiriya, Memo hatiye Cizîra Botan e.

Cardinê mîr dibê em dîsa bêjin. Memo tê heddê dibê navê dilketiya min Zîn e. Beko dibê mîrê mi eva bû xeybet xalî. Xeybet kir wî. Memo bigrin go. Memo digrin dibê em çi 'eta bînin serê Memo, mîr? Beko dibê. Dibê 'eta⁷⁰ wî, hema em ê bigrin bavêne Zîndana darê. Dibê Memo digrin davêne Zîndana Darê. Dibê Zînê radibe bi afîn û ofîna Memo ye. Dibê gotinê gotinçiya dibê [Zîn] qazikekî tijê zêr dike, ser tije qatik dike. Diçe nava şehre Cizîrê leximçiya dibîne. Di oda xu ra lexim davê Zîndana Darê. Qeretajdîn diçe varîdatê top ke. Dibê Beko remil diavêje oho, dibê mîrê mi dibê reml⁷¹ Zînê avêtiye Zîndan darê. Her ro Qeretajdîn dibînin. Memo hildin her ro mîna berxa yek şevî wî xayî dikin. Dibê em ça bikin, dibê em ji wira derxin bavên Zîndana serê çiyê. Dibê Memo ji wir derdixin diavêjin Zîndana serê çiyê. Axîn û oxîna Zînê ye. Memo û ew ji hev qetiyaye.

Dibê ji hev qetiya. Dibê kavranekî tê derê Qeretajdîn ra derbas dibe. Sitî diçe pêşiyê. Dibê ev kavranê kê der e? Dibê kavranê Yemenê. Ê dibê kavranbaşî ez kaxezek bidime te mektûbek. Tê herî ku? Dibê ez ê herim Roşka. Dibê tu ewê mektûbê bidî Qeretajdîn. Kavranbaşî dibê tu ramûsanekî bidî mi ez ê biherim. Dibê baş e, bira be. Gava ku ramûsanê dide kavranbaşî, li pişt mektûbê dinivîse dixê zêrê. Dibê Qeretajdîn kavranbaşî gihişte te gere sax nehêlî. Bira were Roşka, mektûbê bide Qeretajdîn, Qeretajdîn mektûbê dixwîne. Gazî firinçiya dike. Dibê kavranbaşî bavêne ardûya firinê.

Bira, tê da nivîsiye dibê halê Memo bû ev. Avêtine filan Zîndanê belkî tu xu bigihîne belkî xu negihîne. Bira Qeretajdîn, kavran, vergî û vardata ku top kiriye bi rê xe bê. Beko reml davêje. Dibê mîrê mi sibê vî çaxî Qeretajdîn tê. Dibê em ça bikin? Dibê Zînê bişîne bira here Memo ji xu ra derxe bîne.⁷² Dibê cab dane Zînê, Zînê Rihanê hilda çû.

dibê Zînê berê xu da Zîndana serê çiya j'xwe ra dilezîne
dibê ayay ayay Memo dilê mi dîne
Zînê hatiye li ser Zîndana serê çiya Memoyê Alan derîne
dibê dilê mi şexs û zîyaretê van kaşa⁷³
li derê zîndanê sekinî go selam aleykim Mîr Memoyê kurê Mîr Alan Paşa
Zînê devê zîndanê sekinî go Memo dilê mi dîne
Zînê hatiye te'j xu ra derîne
Memo go Zînê tu nehatî mi derînî tu hatî rihê şîrîn j'Memo bistînî

⁶⁹ Li vir peyvek nayê fêmkirin.

⁷⁰ Vê peyvê bi şaşî dibêje dî re bi awayekî din dewam dike.

⁷¹ Dengbêj li vir bi şaşî di dewsa lexim da dibêje remil.

⁷² Guhdarek bi tevî dengbêj vê ferde dibêje.

⁷³ Ev der dawîya beşa ewil a kasetê ye. Perçeyê duyem li ser înternetê bi dest nakeve û di herdu qeydên li ser înternetê de ev beş jî mîna beşa ewil tune.

*divê Memo li zîndanê da xu xebitî
bîst heb ciya movikê piştê Memo ji hev filitî
Zînê Memo derxiste derê zîndanê
nihêrî xuna sor dev û lêvê Memo da li ser kurkê dereba Rebbî diniqutî*

*dibê Zînê go ya Rebbî Xudayê şev û roja
ya ziyaretê şexsê van beroja
belkî Zînê dû Memoyê Alan ra dinyayê Rebbî nemîne di roja*

Go bi hawayê ku dibêjin go Zînê jî bi îrada Rebbê ‘alemê dû Memo ra du roya dimîne ew jî dimire. Go wexta Qeretajdîn xu gihande şehr. Go stî çû pêşiyê go mala te xira be tu heta hatî Zînê jî mir Memo jî. Hey nabe go? Go erê. Go Qeretajdîn li vardatî jî kavran û xeracê hilmade. Çû hilda kete nav Cîzîrê.

[guhdark] : Ancax rind kiriye
[Kazoyê Garisya] : Him?
[guhdark] : Ancax rind kiriye

kete nava Cîzîrê. Go rast û çep lê xist çî kete ber, ji kal û pîr ji zara. Beko go remil avît go Qeretajdînê koka Cîzîrê bîne. Go pîrek şande deve avê. Go mihlêye dê were ez hêriyê dişom. Ê dibe tu hêriyê dişoyî çira dişoyî. [Pîrê] dibê ez dişom hêriya reş spî dibe. [Qeretajdîn dibê] hey mel’ûm hêriya reş çawa spî dibe. [Pîrê dibê] ê lê dibe mirîye ku çil roye miriye teze wê ku rabe tu ketî navê millet qet dikî.

[Qeretajdîn] dibê pekî dîşûnmîş dibe. Dibê te qe Beko nediye. Dibê a Beko wê xirbê han da ye. Qeretajdîn tê ser gazî dike. Dibê Beko derê. Dibê Beko derê. Mi koka Cîzîrê gi anî. Derê em karşî⁷⁴ paşa, axaler û giregira hukûmatê kurmîş kin.⁷⁵ Axakî teşkil kin. Derê. Beko dertê. Dibê de îja bide pêşiya min. Mezelê Cîzîra Bota ye teze zaf in. Mezelê Zînê û Memo nîşanî mi de. Dibê wexta Beko dibe ser mezel. Dibê Qeretajdîn dibê Beko hela mezelê Zînê berê vede. Digo ku vedide dinhêre tê da tine. [Qeretajdîn] dibê yê Memo vede. Yê Memo vedide, bala xu dayê heta girêdanê girêdayî ye. Weke dinê destê xu ber serê hev ra birine, mezel da ne. Beko dibê err mi gora heft bavê xu ga. Wê dinyayê min nehişt xu bigihînine hev vê dinyayê Zînê erd qul kiriye xu gihandiye Memo. Qeretajdîn divê niha te isa kiriye!? Qeretajdîn şûrekî dibê davê serê Beko. Me nebihîstiye, dibên çilkek xwîna wî dirije orta herda.

[guhdark]: Belê isa dibêjin. Belê isa dibêjin.

Dibê nika bûye dareke diriyê. De isa tê gotinê.

[guhdark]: Belê isa dibêjin. Belê bele belê isa dibêjin. Isa dibêjin.

De isa tê gotinê. Eva kilama⁷⁶ zaf dikişîne. Kêfa wî ye. Yalaniz heta vira bes e. Îja bira ez û Dursin em ê çend kilameke din bêjin. Fesîh jî bira hey tev ke. Ew jî dibe hediya. De were bavo. Were bavo. Dursin were.⁷⁷

⁷⁴ Karşî: Hember. Peyv bi tirkî ye.

⁷⁵ Kurmak: Saz kirin, teşkil kirin. Peyv bi tirkî ye.

⁷⁶ Dengbêj Mem û Zînê re dibêje “kilam”.

⁷⁷ Li vir dest bi kilama Qulîxanê Cibirî dîke û di cihêkî de dibêje “dengbêj du-sê heb hene yek nabêje. Heyran giş kirine istûyê mi. Ma de ez ça kim. Guhdarek jî dema ku dengê Kazo di kilamê de dixulxule tê kelecane û dibêje: “Deng teze derket, razan tine kes ranazê!”

Extended Abstract

This article examines a new oral variant of the renowned Kurdish romance, or *destan*, *Mem û Zîn*, which was performed by Dengbêj Kazoyê Garisya (1925-2005) during a wedding ceremony in Ağrı, approximately between 1980 and 1990. As a cornerstone of Kurdish oral tradition, *Mem û Zîn* reflects the rich cultural heritage of the Kurdish people. The study examines the socio-cultural and situational context of the performance, including the dengbêj's spontaneous commentary as well as the audience's contributions in shaping and responding to the oral epic narrative. This study also critically examines the textualization processes involved in documenting such performances in Kurdish folklore collections. Ready (2015) defines the textualization processes as "the creation of a written text based on the recording of an oral performance", a process this study finds to introduce various ideological and linguistic "filters" that significantly impact the authenticity of the narratives. We highlight how methods of collecting, transcribing, and editing—often with modifications—introduce these filters, sometimes in efforts to create a "master text." This process reveals potential ideological implications and demonstrates how the push towards the modernization and secularization of epic texts can inadvertently distort the original oral narratives, consequently erasing vital cultural elements. Therefore, this article advocates for a more nuanced and careful approach to textualization that respects and preserves the rich contextual framework of Kurdish oral traditions.

Employing Lauri Honko's (2000) concept of "textualization", this research explores the deliberate intentions behind transforming oral narratives into recorded forms, emphasizing the significance of situational context. This framework facilitates a deeper understanding of how the dynamics of performance—characterized by the dengbêj's delivery, audience responses, and their collaborative contributions—interact to produce a collective interpretation of the epic. The collective aspect of storytelling emerges as vital for preserving the integrity of Kurdish oral art, demonstrating how audience participation shapes the narrative in real-time. The variant presented by Kazoyê Garisya, previously undocumented in academic discourse, provides a valuable lens through which to explore the interplay between oral tradition and contemporary expression. This study underscores the necessity for a context-centered analysis that acknowledges the complexities inherent in performance settings, audience engagement, and the social interactions that enrich the storytelling experience.

Through a detailed analysis of the tape recording of *Mem û Zîn*, this article uncovers critical insights into the performance's structure. The engagement level of the audience emerges as a key factor influencing the narrative's direction. For instance, the dengbêj's interactions, including moments of self-correction and acknowledgment of audience contributions, are crucial in sustaining the performance's vitality. Notably, the audience's excitement and active involvement transform the storytelling experience into a shared event, where the boundary between performer and listener becomes increasingly blurred. The communal experience fosters an atmosphere of participation and emotional investment, as evidenced by the spontaneous responses elicited during the performance, where no audience member remains indifferent, reflecting the profound connection to the narrative. The findings of this study reveal the economic aspects intertwined with the performance of *Mem û Zîn*. It becomes evident that the dengbêj not only delivers a cultural narrative, but also seeks compensation for his artistry, underscoring the interplay between cultural expression and economic realities. In his performance, the dengbêj states, "God bless him. I've filled three cassettes for him. Now it's up to him whether he chooses to give any money; he knows what he appreciates." This aspect of performance raises questions about the sustainability of oral traditions in contemporary contexts and the potential implications for artists who navigate the tensions between tradition and modernity. Such considerations further highlight the importance of recognizing oral performances as complex artistic endeavors that encompass not only storytelling, but also an artist's livelihood.

Furthermore, during the performance, the dengbêj openly acknowledged forgetting a few lines, candidly reflecting, "I should have sung a few lines, but I didn't; they remain. I didn't sing them." This moment of self-reflection unfolded before an audience that is well-acquainted with the epic and who actively contributed by attempting to correct and fill in the missing parts. Such interactive dynamics illustrate the collaborative nature of oral tradition, along with emphasizing the fluidity and adaptability of the performance. In summary, this article contributes to the field of Kurdish oral literature studies by providing an analysis of a newly documented variant of *Mem û Zîn*, contextualized within its performance environment. It emphasizes the need for an integrated approach that honors the dynamic nature of oral narratives while addressing the socio-cultural and economic dimensions that shape oral performances. The study serves as a reminder of the significance of oral tradition in maintaining cultural identity, fostering communal bonds, and ensuring the continuity of Kurdish heritage in a rapidly changing world.